

HIKYATÊN CIMETA KURDA

Pirtûk tê weşandinê bi alîkarya serokê
Înstîtuya kurdî ya Parîsê, dostê qedirbilind, doktor
KENDAL NEZAN.
Em sipasiya xwe elamî wî dikin

ՔՐԴԱԿԱՆ ԺՈՂՈՎՐԴԱԿԱՆ ՀԵՔԻԱԹՆԵՐ

**Գրառեց և պատրաստեց
ՀԱԶԻԵ ԶՆԴԻՆ**

Երկրորդ հրատարակություն



**ԵՐԵՎԱՆ
«ԼԻՍՈՒԾ» ՀՐԱՏԱՐԱԿՉՈՒԹՅՈՒՆ
2011**

**HIKYATÊN
CIMETA KURDA**

**Ji zarbêja nivîsî û hazir kir
HECÎYÊ CINDI**

Weşana duyemîn



**YÊRÊVAN
WEŞANXANA “LÎMÛŞ”
2011**


ՀՏԴ 398
ԳՄԴ 82
Ք 931

Pirtûka “Hikyatên cimeta kurda” cara yekemîn
sala 1959-a bi tîpêن kîrîlî hatibû weşandinê.

Ք 931 **Ջրդական ժողովրդական հեքիաթներ/**
 Գրառեց և պատրաստեց Հաջիե Զնդին.- Եր.:
 Լիմուշ, 2011.- 90 էջ:

ՀՏԴ 398
ԳՄԴ 82

ISBN 978-9939-64-079-2



ŞENGİLO- MENGİLO

Carekê bizinek ji nava pêz vediqete diçe çiyê, binê zinarekî xwera dikole, holikê ava dike, xwera dike gom, têda dizê: sê kara tîne. Navê yekê datîne Şengilo, navê yekê Mengilo, navê yekê jî Qalîçengilo.

Kar ku mezin dibin, maka wan şîret dike, dibê:

- Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo, ez qurbana we, niha ezê herim çêre, kengê ez hatim, min got:

Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo,

Ez çûme zozana,

Qırşık kete ber dirana,

Şîr kete gihana,

Dayka we hate dena-

Derî vekin,-

hûn paşê derî vekin, werine dena.

Çend roja usa derbaz dikin wî hesabî. Rojekê gur gilyê wana dihese. Bizin ku sibê zû radibe, diçe zozana, berî bizinê gur tê dibê:

“Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo,
Ez çûme zozana,
Qırşık kete ber dirana,
Şîr kete gihana,
Dayka we hate dena-
Derî vekin”.

Şengilo dibêje:

-Mengilo, Qalîçengilo, derî venekin, eva diya me nîne, wexta dena nîne, dengê diya me zirave, lê yê evê qaline, derî venekin.

Mengilo dibê:

- Na, eva diya meye,- derî vedike.

Çaxê Mengilo derî vedike, gur wê çaxê Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo dadiqurtîne.

Bizin wextê xweda tê, dinhêre ne Şengiloye, ne Mengiloye, ne Qalîçengiloye, tunene.

Bizin radibe diçe cem teyr dibê:

- Te karê min birine?

Dibê:- Vî erdî, vî ezmanî min nebirine!

Bizin diçe cem leglegê, dibê:

-Te hersê karê min birine?

Dibê:- Vî erdî, vî ezmanî min nebirine!

Bizin diçe cem rûvî, dibê:

- Te hersê karê min birine?

Dibê:- Vî erdî, vî ezmanî min nebirine!

Bizin diçe cem hirçê, dibê:

- Te hersê karê min birine?

Dibê:- Vî erdî, vî ezmanî min nebirine!

Bizin dinhêre gur rastêra diçe, dibê: “Vî gurî karêd min xarye.” Diçe, dibê:

- Gur, te hersê karê min birine?

Gur dengê xwe nake.

Bizin dibê:

-Dêmek te Şengilo, Mengilo, Qalîçengilo birine. Şerê min tera şere,- dibê,- guro, tu diranê xwe tûjke, ezê jî sitrûyê xwe tûjkim, emê şerr bikin.

Bizin diçe ser hedad, sitrûyê xwe rind tûj dike, gur jî diranê xwe tûj dike.

Paşê têne meydanê, hevra şerr bikin.

Gur dike-nake bizina kûvî nikare. Bizina kûvî sitrûyê xwe tûj li zikê wî dixe, banz dide kolê, gur dikuje. Zikê wî diqelêşe, Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo derdixe, dibê:

-Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo, hûn kuda çûbûn, çevê diya we korbe.

Dibê:- Hal û hewalê me û gûr ev.

Bizin dibê:

-Sengilo, Mengilo, Qalîçengilo, ez qurbana we, eva wera şîret, careke dinê xwe şaş nekin,- û karê xwe hildide dibe ciyê.

GUR ÇAWA XAPYA

Wextekê koçer dadigerin. Boxekî jar dewsa wara dimîne.
Gurek rastî wî doxeyî tê û dibêje:

-Boxe, ezê te bixum.

Boxe dibêje:

- Malava, tuyê çî min bixwî? Min zozana bigerîne, çayîra
biçêrîne, ezê kok bim, paşê min bixwe.

Gur box çiya gerand. Boxe gelekî kok bû. Rojekê gur gotê:

- Box, îdî wextê xarina teye.

Box gotê: - Gur can, ev kapê qirika min te dîtye?

Go:- Erê!

Go:- Serê xwe ber kapira derbazke, hergê derbaz bû – hê
jarim, hergê derbaz nebû – wextê xarina mine îdî.

Gur go:- Ser çevê min!

Gur serê xwe bin kapra kir, serê wî derbaz bû. Wexta derbaz
bû, box da lodika, gur pêva darda bû. Wextekê serê gur bin kap
derket, nehiş ket, box jî revî çû.

Hişê gur hate sérî, xwexwera go: “Min çî kir, gotî min
pêşyêda bixara, box ecêbeke wa anî serê
min.”

Gur rabû rê ket.

Çû zozaneke dinê. Rastî hespekî jar,
topal, piştkul hat, gotê, go:

- Hespo, ezê te bixum!

Hespê gotê:- Tuyê çî min bixwî? Ser
min çerme, wekî dinê-hestuye. Min çiya,
zozana, mîrga biçêrîne, ezê kok bim,
paşê goştê min bixwe.

Gur go:- Ser çevê min!

Gur hesp çêrand. Hesp gelekî kok bû. Gur gotê, go:

-Hespo, îdî wextê xarina teye.

Hespê gotê, go:



- Mixekî bin lingê min daye, hergê te kişand – ezî kokim, hergê te nekişand –ezî jarim.

Gur go:- Ser çevê min!

Hespê lingê xwe bilind kir, gur diranê xwe avîte bizmar, evî hespî refesek lêda. Gur ket. Hesp revî, çû...

Gur xwexwera got: “Gotî min ew zû bixara, ewî ev emel anî serê min” û rabû rê ket. Çû rastî sê kara hat, karê deh rojî.

Got:- Ezê we bixum.

Kara gotin:- Tuyê çî me bixwî? Herekê me gepeke, lê wekî tu me biçêrînî, her yekê me têra rojekêye.

Gur go:- Birabe,-û kar çêrand, zozana gerand.

Kara gotin:- Îdî wextê me qijilêye, şore bixun, hewşana bixun, goştê me wê tembe û wê wexta xarina mebe îda.

Gur karê xwe anî qijilê. Kara şorr xar, hewşan xarin.

Gurê birçî go:

- Îda ezê we bixum.

Kara gotin:

- Em herine ser avê, avê bixun, paşê me bixwe.


Gur kar anîne ser avê, kerî pez jî ser avê mexel bû. Kara gotin:


- Guro, tu lezekî zurnêxe, em dora te herin –bên, wekî goştê me te xweş bê.

Gur zurinê da, kara list. Gur wextekê lê nihêrî kar revîne, çûne gihiştine keriyê pêz. Héja gur xwexwera got: “Bavê min dida lodika, bavê min nalbendî dikir, yanê bavê min zurnrçî bû, wekî min da lodika, nalbendî kir, bûm zurneçî?... lema jî ew her tişt ji destê min çû...”

Û ji wê rojê gur îda bawarya xwe kesî nanî.

Çi rast tê davêje ser, wekî bixwe.





GUR ÇAWA TIRSYAN

Wextekê hespekî rabû berê xwe da zozana. Çû rastî dîk hat.
Dîk go:- Hespo, tê kuda herî?

Go: -Ezê herim zozana,
Bigerim mîrg û çîmana,
Payîzê bême arana.

Dîk go:- Ezê jî bêm.
Herdu pev ketin û rê ketin.Çûn rastî beran hatin. Beran go:
-Hespo, tê kuda herî?

Go:- Ezê herim zozana,
Bigerim mîrg û çîmana,
Buxum gul û gîha,
Payîzê bême arana.

Go:- Ezê jî bêm.
Ewana jî pev ketin, çûn rastî kêwrîşkê hatin.Kêwrîşkê go:
-Hespo, tê kuda herî?

Go:- Ezê herim zozana,
Bigerim mîrg û çîmana,
Buxum gul û gîha,
Payîzê bême arana.

Go:- Ezê jî bêm.

Kêwrîşk jî xwera hildan çûne zozana.

Wextekê peraniya gura rastî wan hat. Gura taqet nekir bavêje ser. Gurekî ji nav gura dil da xwe û gihişte hespê û berîn. Hespê gotê, go:

-Gur, tu çi dixazî?

Go:- Ez dixazim, wekî berên bidî min ez bixum.

Hespê gotê, go:

-Were pêşiyê min buxe.

Wexta gur ber bi hespê çû, hespê serê wî kire orta lingê xwe û givaşt, beran hat pê qoça lêda, kêwirîşk revî çû, dîk qe haj pê tunebû: nikulê xwe erdê dixist. Gur teherekî destê wana xilaz bû, çû gihişte hevalê xwe.

Gura gotin:- Kuro, qe çi heye?


Go:- Birevin, mala we xiravbe.

Ewan revîn, ha revîn.

-Kuro,-go,- bese, em biecîn,-go,- de bêje çîka çi bû?

Go:- Ez wexta çûm,
Yekî serê min kire orta du dara,
Yek hate min bi gopala,
Yekî tirba min dikola,
Yekî jî hewarî dibire mala,
Ancax ez revîm, hatime vira.

Gura go: - Kuro, de ida nesekinin, em birevin.



RÛVÎ Û GUR

Rûvî û gur dibine birê hev.

Wextek derbaz dibe: êl dadigere, guhdirêjek dewsâ warê zozana dimîne, kelb jî pêra. Ew guhdirêj radibe dike zirîn. Rûvî dibihê, divê: "Tu bisekine, niha cem kerê kelb jî hene, ezê ecêbekê bînime serê gur, belkî yaxa xwe ji destê wî xilazkim." Gur ji dilê xwe saxbûye, dibê:

- Rûvî, bira, rave, were em herin guhdirêjek dewsâ warê xwe maye, zef şîveke xweşe, were em herin bînin.

Wî çaxî ew kelb pê dihese, dilê wîva eyan dibe, dibêje guhdirêjê, dibê:

- Malxirab, te ocaxê xwe korkir, yê min jî da ser.

Ijar guhdirêj dibêje:

- Wekî min ocaxê xwe kor kir, yê te jî da ser, em çi bikin?

Kelb dibêje:- Em çi bikin? Ocaxê me kor bû, wexta gur bê wê te bixwe, ezê jî wê bimînim tenê.

- Ê,- guhdirêj dibêje,- wekî min bixwe, wê te jî bixwe.
- Ê, -dibê,- ez çi gunekarim, wekî min bixwe, te kirye dengî, xwe min dengê xwe nekirye, wekî min bixwe?

Kelb guhdirêjra dibêje, dibê:

- Tu were ezê vira cîkî bikolim, tu here ocaxê xwe korke, hine pûş-pelaş bîne ser minrake. Wê qirarê, tu xwexwe ser minra bisekine. Gava gur tê, tu dengê xwe neke. Gur bê, ku te bixwe, ezê rabim gur bixeniqînim.Tu bêjî min: “Eferim!” Hingê ezê qewatbim, dileşq bixeniqînim.

Gur û rûvî berê xwe dane guhdirêjê, go:

-Bira, em herin, mera risqekî zefî xweşe.

Rûvî gote gur, go:

- Bira, were biterkîne, qeda ji wî tê.

Gur gote rûvî, go:

- Tu kurê camêranî, çi qeda jê bê, tu tenê were bisekine, ezê bixeniqînim- tu ji bixwe, ez jî bixum, besî min û hevtê govek bavê teye. Ne peze, ne deware, qismete, xwedê daye.

Rûvî û gur lêdan çûn. Gur gote rûvî, go:

- Birê minî biçûk, tu were here dora guhdirêjê here-were, rûvîtya bike, tewlebazya bide xwe, bira hinekî irnê min rabin, gava guhdirêj hejiya, ezê dadimêda, îjar bixeniqînim, îjar ez û tu emê bixun.

Rûvî gote gur, go:

- Bira, bîne were, xebera min bike, evê derê biterkîne, min îşev xewneke xirab dîye.

Gur go:- Hey mala te xirab nebe, tu herro xewina dibîni, qe xewinê te xilaz nabin?

Go:- Hizdikî, kêfa teye, bira, hizdikî ezê herim, lê hema tuyê poşman bibî.

Rûvî hinekî pêşda çû, careke din vecêniqî, paşda hat, go:

- Hey malxirb, wêderê tiştek diçirûse, go, welle ez naçim.

Gur go:- Wekî usane, tu bırakî qelpî, ezê rabim te aleperçeyî bikim, tu vê sibêda min divî-tînî, ez ne zarê bavê teme.

Rûvî gote gur, go:

- Hey malxiravnîn, tu çira usa mixeneti, go, bira, tu zanî ez dekbazim, ezê xilazbim, tu xilaz nabî, tuyê bikevî tomikê.

Gur rabû hêdî-hêdî pêşda çû, lê rûvî go:

-Bira, were xebera min bike, ziyan ji wêderê tê, tiştek wêderê diçirûse.

Gur go:- Malxiravnîn, ca were nîşanî minke, qe ez nabînim...

Gur rûvî da pêşya xwe, go:

-Bira tu biçûkî, tu naxweynî, here binhêre, herkê tiştek heye, emê birevin, herin.

Rûvî go:- Welle, turuş nakim, tu were min bigire.

Gur go:- Were, biratiya min û te herame, were em her yek xwera herin.

Go:- Em çawa ji hev biqetin? -go,- tu ducarî minî, tu here, ezê jî bêm.


Gur rabû hêdî-hêdî pêşda çû kerê bixwe.Kelb rabû situ gurra çû. Rûviyê te tewlebazek da xwe, go:

- Min nego, axir ziyana te tê heye?

Gur gote rûvî, go:

-Tu rûviyê dekbaz bûyî, te dek anîn serê min, te ez dame kuştinê. Hemîn biratya te, biratya gur û rûvî bû.

Kelb gur xapand, guhdirêj, rûvî jî xwera xilaz bûn.



RÛVÎ Û MER

Wextekê rûvî merva bûne dijminê hev. Zef dijminayî bi hevra dikişandin. Mer dixwest rûvî bikuje, rûvî dixwest mer bikuje. Xulese, bi dijminayî dû hev digeryan, hê yekî zemet negîhande yekî.

Rûvî duşurwmış bû, go: "EZ mer nikarim, go, EZ bi birafî nexapîniim, mer nekujim- wekî dinê EZ pê nikarim." Rastî mer hat, merra go:

-Bira!

Mer go: - Ci dibêjî?

Go:- Were EZ û tu bibim birê hev!

Mer go:- Birabe!

Hema mer jî zanibû rûvî dijminayî li wî digere, rûvî jî zanibû. Ew herdu- mer û rûvî bûne birakê hevdu, bi hevra geryan. Ketic rastekê. Rûvî pirsî, go:

-Mer, bêje, go, tu ku rê diçî, çira usa xaromaro rê diçî?

Mer go: - Bira edetê me usane, cisinê me usane. Go, lê wextê teji berî te didin tu çira poçika xwe vî alî, wî alî davêjî?

Go: -Bira, go, ez tejiya dixapînim.

Go:-Dêmek, usane, tu min jî dixapînî?

- Ê, go, bira, çira ez kor bûme, tu xar dikişî, ez qe nabêjim.

Bi hevdu kenyân. Xulese, xwe naspêrine hevdu. Çûn, gele çûn, gele erd çûn. Rastî çemekî hatin. Mer hilda go:

- Rûvî, bira!

Go:- Çiye?

Go:- Tuyê di avêra derbaz bî, ezê çawa derbaz bim?

Rûvî go:- Zanî tuyê çawa derbaz bî? Go, were li situyê min bipiçik, ezê te derbazkim.

Mer xwexwe ra go: "Awa, ji vî çêtir nabe, go, ezê li situ bipiçikim, ezê bifetisînim." Rûvî duşurmiş bû, xwexwera go: "Min ci kir? Wekî mer li situyê min bipiçike, hazır wê min bikuje, em dijminin, wê min bikuje." Rûvî go:

-Bira!

Go:- Çiye?

Go:- Zanî şuxulekî din jî heye!

Go: - Ci şuxule?

Go:-Qenc-qenc, xirav-xirav, ezê te derbaz kim. Eva ave, qezya jê tê. Ez tuva aqa hevra geryane, aqa emek li hev daye, were ez tu emekê xwe li hevdu helalkin. Tu were em hevdu paçkin, paşê were situyê min, einê herin.

Mer devê xwe anî ber devê rûvî. Mer rûvî paç kir, rûvî go:

- Mer, de tu jî serê xwe virdake, ez jî te paçkim.

Mer serê xwe dirêj kir ber rûvî. Rûvî bi diranê xwe pêşin serê mer hilçiqand. Mer dirêj bû ser qûmê. Rûvî go:

- Bira, biratiya me gere wa rastbe, te dît te xwe çawa rastkir?

Rûvî mer kuşt, jê xilaz bû.



RÛVÎ Û ŞÊR

Rokê rûvî radibe diçe, dibê: "Ezê herim cem şêr. Rûvî çû cem şêr, silav da şêr, go:

-Bira, çend zarê min hene, sitara min cem wan tune, mîvanara çawanî?

Go:- Tu ser çevê minra hatî, go, çi heye!

Sibê rabû, rûvî da dû xwe derket çiyakî mîna çiyayê Qemerda. Revoyê hespa wêderê bûn. Şêr gihîste hespekê, kulmek li pişta hespê da, gote rûvî, go:

- Bira, de keremke bixwe.

Çendek derbaz bû, rûvî gote şêr:

-Bira, go, tu çiqa qewatî, te bi kulmekêra pişta hespê şikênan.

Şêr gote, go:

- Rûvî can, bese wan pale-pistûkiya bikî.

Rûvî go:- Bira, çima dixeydî? Bira, go, lema min xwe te girtye, wekî gilyê me yekbin, wekî ez jî haj qewata te hebim, tu jî haj ya min hebî.

Şêr wî gilyê wîra razî bû. Rûvî go:

- Bira, go, hûn aqa qewatin, hûn ci têne bend kirinê?

- Rûvî, go, tuyê kerbî, yanê ezê rabim te dîwarekî xim?

-Bira, go, xwedê te razî be, çima tu dixeydî, aqasî ez te hisyam.

Şêr hilda gotê:

- Bira, qewata min pê jîkê kevanane, te ki lingê min girê da, qewata min ewe – ez alt dibim.

Rûvî fêlbaz bû, çû ser kaniyê, dîna xwe dayê du libûdçî li wêderêne. Herdu jî razane. Gihîste kevanê yekê, têlê wana jê birî, hilda û berê xwe da şêr, bir çû cem şêr.

- Bira, go, eva çiye, min erdê dîtye, eva çiye?

Go: -Malxirab, eva kevane, jîkê kevanane!

- Bira, go, ka bîne ez pêçiyê te girêdim, çika tu çawa dibî?

Rûvî destê şêr da ser hev, para hişk herdu pêçiyê wî girêda.

- È, go, bira, hela veke, go, çika çawa vedikî?

Şêr destê xwe vekişand, çiqa kire qûrîn –destê wî venebû. De jîk destê wîda rûnişt û venebû.

-Kuro, go, xwedê bela te bidêda, destê min veke.

- Bira, go, welleh destê te venakim, çika were minra bêje, çika dijminê te kî heye?

Şêr go:- Xwedê şama te xirab bike, go, dijminê min kes tune, dijminê min her pilinge.

Rûvî pişta xwe dayê û çû.

Şêr gelekî belengaz bû, dîna xwe dayê –mişkek serê xwe qulêra derxist.

-Birê şêr, go, tu çima wa belengaz bûyî?

Go:- Mişk, go, tu dibînî rûvî ez girêdame.

-È, go, bira, wekî ez te berdim, tuyê heyfa me rûvî hildî? Sitara me jî destê rûvî tune.

Şêr go:- Mişko, qirarbe, go, tu destê min vekî, rûvî ku hat,
îda ew şuxulê mine.

Bira mişk bê destê wî veke, rûvî xwe gîhande çiyê, piling
wêderê dî, go:

-Bira!

Go:- Çiye?

Go:- Biliv em herin, go min şêr daye girêdanê, were heqê
wîra derê.

Û piling da dû, rûvî pêşyê hat, şêr jî destê wî hate vekirinê û
rûvî bayê bezê, bi lez hate cem şêr.

Şêr nerm lingê wî girt -wî alî dîwêr da, li vî alî dîwêr da.
Bela rûvî dayê, go:

-Wey li wî kesî, hevalê rûvîbe,- û lêda çû.

MERIV Ü ŞÊR

Wextekê merivek hebû, pişikeke wî hebû. Pişika xwe usa hînî xwe kiribû, wekî kuda biçûya, pişika wî pêra diçû.

Eva meriyê hana rokê baltê xwe girte xwe, çû mêse dara bîne. Pişika wî pêra çû, kete nava mêse. Pişik çû rastî şerekî hat. Şêr lê nihêrî - heywaneke wa: “ Ew jî lolâ min, lepê wê lolâ lepê min, serê wê lolâ serê min hûre.” Şêr jê pirsi, go:

-Heywan, go, tu begzemîşî min dibî: serê te, lepê te ew jî lolâ yê min. Tu çira wa hûrî û sêfil û çûkî?

-Hewî,- pişikê go,-yê ku ez dêstdame, wekî tu destda bî, tuyê hela ji min hûrtirbî.

Irîn şêr hat, go:

-Çawa, ew merivê tu dibêjî, kanê, nişanî minde ez biperifînim.

- A, go, waye, dara dibire.

Şêr eynata xwe anî, xwe dirêj kir, pêra xeberda, go:

- Tu çawa merivî, eva heywana wa dest teda belengaz bûye, çûçik bûye?

Go:- Ez merivekî xortim.

Go: - De tividarekê xwe bibîne, ez û tuyê şerkin.

Merivê xweyê pişikê hilda jerra got:

- Lepê te hazirin, tuyî bi qewatî, de tu bisekine ez jî herim hacetê xwe bînim.

Şêr go:- Ezê bisekinim.

Ewî merivî go:

- Na, tuyê birevî, were ez lingê te girêdim, tu derekêda neçî, heta têm.

Go:- De were girêde.

Meriv balte hilda, darekê xist, qelaşt, herdu lingê wî kirine ortê. Berk, temiz mehkem bi kendira girê da, go:

- Ka ez destê te jî girêdim, tuyê bi destâ lingê xwe vekî herî, ezê destê te jî girêdim.



Destê wî kir qelîşteka darê, destê wî berk girê da. Lê nihêrî şêr îda nikare ne lingê xwe, ne destê xwe derxe. Da qoçe dar li kêlekê şêr ket, de dayê –bû qareqara şêr, gazi kir, go:

- Birê biçûk, eva heta kengê wê li minxe?

Go:- Heta tu qasî min çûçik nebî te bernade, wê te bikuje.

Şêr go:- Ka, bira, min dikute-nakute ez lola te çûçik nabim, go,- bese li minxî, go, eferim pişikêra, ku dest teda teyamîş dide. Ad û qirarbe neseba (cisinê) min mêseda zefin, wekî tu min berdî, ezê teme bikim, neseba min nava mêseda kes nêzîkî te nebe. Em bibin birê hev.

Şêr ad kir destê wî merivîda. Mêrik rabû dest û piyê şêr vekir. De şêr qewilê biratiyê dayê, ancax ji destê wî xilaz bû.

Şêr çû ji xwera, bira here karê xwe nava mêşe, xweyê pişikê pişikêva jî darê xwe hildan hatin şeherê xwe.



ZEWACA ŞIVAN

Wextekê şivanekî navê wî Zoro, pezê xwe biribû şikeftê. Çend roja dinhêre rûvîk tê. Şvan ji xwera nanê xwe çê dîke: nan be, goşt be, çik hebe hevra dixun.

Rûvî diçe ji xwera digere, rastî gur tê, gurra dibê:

- Bira!

Dibê:- Çiye?

Dibê: - Rabe mala birê min usa heye, ciyê germî xweş, dibê, were em herin, birê min usa nan dide min, nanê xwe dixun, em ji xwera vedilezin, radizên.

Rojekê şivan pez tîne, dinhêre gurek jî va hatye. Şivan dibê: "Welleh, ev fêlê rûvîne, rûvî çûye ew ankiye."

Wexte gur û rûvî digerin, rastî hirçê tê, dibê:

- Hirçê, çima ciyê sar digerî, bırakî me heye- em êvarê diçin, nan dide me, qeliyê dide me, em ji xwera diçin ciyê germda radizên.

Wextekê şivan dinhêre hirçek ji wa hat, şivan dibê: “Welleh, şuxulê rûvîne, rûvî vana tîne.”

Carekê jî gur, rûvî, hirç digerin, rastî kûçkekî têñ, dibêñ:

-Bira; çima usa tenê digerî – zikek têr, yek birçî?

Dibê:- Lê çawa bikim?

Dibêñ:- Birakî me heye, hiñ nan dide me, him jî ciyê germ, were em herin cem wî.

Kûçik dibê:- Wê çêtir, ezê bêm.

Êvarê şivan dinhêre, ku kûçik jî va anîne. Dibê: “Eva kirê rûvîne.” Goştê wana dide ber û radibe, radizê.

Pênc-şeşekî cem şivîn dimînin. Rûvî dibê:

-Bira, kuro, em nanê vî merivî dixun, qelinê wî tune bizewice. Lazime em birê xwe bizewicînin.

Dibê:- Ew çawa dizewicînin?

Rûvî dibê: -Zanî çiye, dibê defa Tajdîn odêdane, dibê, emê herin arîkê biqelişin, hûn pişta min bigirin, ezê xwe têra dahêlim, ezê def û zurnînê derxim. Me ku derxist, bira gur defê hilde, hirç jî zurnînê hilde, ez jî wê ber bilîzim, kûçik jî bira bike hêwerze. Em çûne fêza gund, emê li defê xin. Me ku defê xist – qîz, bûk, xelqê bê dîtina me, bilîzin. Ez jî wê nola yalançıya ber wan bilîzim. Ija ew ku hatin, bera gurî qewate, bera qîzekê bavê ser milê xwe birevîne, em jî wê pêra vegeerin.

Evana hatin, çûne fêza gund: hirçê li zurnê xist, gur defê xist, rûvî jî li ber lîst, kûçik jî kir hêwerze. Evan qîz, bûk, jinê gund hatin sêrê. Gurê te qîzek hilda, revand. Îda pêra negihîstin – pey ketin, pêra negîhandin...

Qîz anîn hatin şikeftê.

Êvarê şivan go: “ Welle, fêlê rûvîne, ev qîz anî şikeftê.”

Şivan kulav ji qîzêra anî, nan anî. Nanê xwe xarin, qîzê nexar. Ber qîzê gerya.

Qîzê go: - Gur ez revandime, ez tirsyame.

Ji xwera kavirek şerjê kirin. Ewî û qîzê xarin, goştê xwe hildan. Rûvî ber xwe neda, rabû goşt xar. Şivan rabû, darek rûvî xist. Rûvî velezya, go:

-Wey, pişta min...

Rûvî go:- Gere em ji birê xwe cihêbin, birê ez çima bona
goşt kutam?

Êvarê rûvî rabû çarixê wî xarin, rabû defa xwe dizî, ji
hundur derxist.

Sibê şivan rabû –çarixê wî tune: vî alî gerya, çarixê wî tune,
wî alî gerya, çarixê wî tune. Şivdar hilda kêleka rûvî ket.

Rûvî, gur, hirçêva xeyidîn, rabûn derketin. Rûvî nav gur û
hirçê da, go:

-Birê min ez kutame. Para me heft pezin, gere em heft pezê
birê xwe bixun, gere em jê cihêbin.

Ewana rabûn sibê ketine nav pêz, heta şivan pê hesya –heft
heb xarin. Şivan rabû gur, hirç, rûvî derxistin, lê kelb berneda.

A ji wê rojê rûvî, gur, hirç bûne heywanê beyanî, lê kûçik
ma cem mîriv.





CABA AQIL

Merivek rêda çû, lê nihêrî lingê devekê hatye derbaz bûye.
Li weşa devê nihêrî, li fesala devê, ewî her tişt fem kir...

Derbaz bû, çû. Lê nihêrî merîk wê ji wêda direve, tê.

- Selam elêkim!

- Elêkim selam, ser çeva, ser sera! Qurban, go, tu çima usa
direvî, ci li te qewimye?

Go:- Heyran, deveke min hatye unda bûye, niha pey deva
xwe ketime, navînim.

-A, go, deva te kor bû?

-Erê!

Go:- Kulfetek duhala ser bû, takî wê rûn bû, takî wê jî dims
bû?

- Ê, go, lê kuda çû?

Go:- Welleh min nedîtye, min qeretûyê wê nedît.

- Lê çawa te nedîtye, çawa salixa didî?

-Qurban, go min tera go, min nedîtye.

Xayê devê milê wî girt, bir dîwanê. Merivê dîwanê da xeberdan, go:

-Te çawa dîye?

Mêrik lê nihêrî, tiştek li xwe danayne, hema dibê: “Ez zanim.” Wî merivê dîwanê destê xwe kire cêba xwe, şeyê rûyê wî hebû, kire destê xwe. Destê xwe hişk lê girt, go:

- Eva çiye?

Ewî merivî caba wî da, go:

-Destê teda tiştek heye, tiştekî zere, navê wî jî şeye.

Ewî destê xwe vekir – zere jî, şeye jî. Go:

-Rast tu bilyan zaneyî, lê te ya wê devê çawa tê derxist?

Go:- Min deve usa zanibû, deve alîkî rê çêrya bû –min zanibû kore, ji çevekî kore.

-Lê te çawa zanibû kulfete ser, duhalaye?

- Min zanibû kulfetê deve ix kirye, jê peya bûye. Wexta rabûye, herdu lepê xwe dane erdê, paşê rabûye.

- Lê te çawa zanibû- takî wê rûne, yê dinê dimse?

- Li wêderê min zanibû- dewsâ takî mês lê civya bûn, dewsâ takî mûrî. Mûrî li aliyê dims civya bûn, mês li aliyê rûn.

Icar merivê dîwanê li wêderê izina wî da, go:

-Eva meriva esnafe, azate,- yê dinêra jî go,- niha tu here pey deva xwe bigere, belkî tu deva xwe bivînî.



ŞERO, POLO

Wextekê Şero, Polo birê hev bûne. Poloyî aqil bûye. Ciqa roj bûya meriv dihatin ber derê Polo şikyatê Şero dikirin, digotin:

- Şeroyê birê te îro zara me xistye, zirar daye me...

Polo jina xwera dibê:

- Jinik, eva wa nabe, ewê me xûndar bike. Tu şev rabe û çi pese-pûsê me sivik heye têke hundurê çewalekî, tiştekî, emê şev rabin, ewî di xewêda bihêlin û destê kurê xwe bigirin, lêxin herin.

Wî çaxî jî Şeroyî hişyar bûye, gişkî dibihê. Eva xêleke şevê diçê, ewe raza bûne. Şeroyê te radibe, wan hûr-mûra gişkî çewal derdixe, xwexwe dikeve hundur, palasekî, tiştekî davê ser serê xwe.

Polo hişyar dibe, dibê:

- Keçê, rabe, hê ew hişyar nebûye.

Radibin, tirsa wî çirê vêanaxin û Polo teriyêda dibê:

-Keçê, çewal bide pişta min.

Jina wî dide piştê, hetanî dide piştê ci halî. Jina xwera dibê:

-Wey mala te xirabbe, te ci nemaye kiryê, çıqa girane.

Jina wî dibê:- Lê em çawa bikin?

Usa nerm dêrî vedikin, destê kurê xwe digirin û diçin. Gava nava gund dikevin, kûçikê gund yek namîne têne wan.

Polo dibêje:

- Wa, heylê min malxirabî, dibê, kûçikê me bixun, dibê, iro eva derbê Şeroyê bira bû, nav keta.

Gava usa dibê, Şeroyê bira ser pişta wî dibê:

-Bira, dibê, min berde, ez vama.

Polo gava Şeroyê bira ji pişta xwe datîne, Şero güçê çewalê digire, dikeve nava kûçika. Ew kûçik sax dimîne, ber derê xayê xwe nehatye...

Usa jî eva Poloyê bira radibe çevê birê xwe paç dike, dibê:

-Tu nîbyayî kûçika wê me bixarana,- û usa Şeroyê bira hiltîne tîne malê.



DEREWÎN

Sê bira diçine nêçîrê. Rastî sê peza tê: yeke xwe geverbûyî, yeke şerjêkirî û yeke mirarbûyî. Dibê:

- Em kîjanê bibin, kîjanê nebin?

Dibê:- Emê ya şerjêkirî bibin.

Ya şerjêkirî dîbin, diçin. Diçine gundekî xirabe, rastî sê avaya tê: yekî bê şenlik, yekî bê ava, yekî xrabbûyî. Diçine hundurê yê xirabe, dîna xwe didinê sê dîze wêderêne: yeke şikestî, yeke bê çemil, yeke bê binî. Ya bê binî dîbin diçin, goştê xwe hûr dîkin, dîkinêda, goştê xwe dadihêlin tendûrê, dikelînin. Sibê radibin, dîna xwe didinêda: goşt çûye, av maye, nanê xwe navda hûr dîkin, dixun.

Wêderê boxçek dîtin (qe nizanîn navda çiye jî). Hersêk bezîn, yekî go:

-Minra!

Ewî go:-Minra.

Ewî go:- Minra.

Go: - Em herin cem qazî, bira gilyê me şiroveke, çika me kêra dikeve?

Qazî go:

- Werin, çika kê we zef derewa bike, axryê wê bigihîje wî.

Yê mezin girt go:

- Welleh, wextekê bare garisê min hebû. Min dîkê xwe bar kir, go, ez çûm ber devê çemekî, min kir û nekir dîkê min derbaz nebû, min garisê xwe kire kewkanî, jimirî, avîte wî alî çêm. Derbaz bûm wî alî çêm, min garisê xwe jimirî, libek jê kêm bû. Ez geryam virda-wêda, min bençarixa xwe vekir, dinhêrim wê libek têda. Min hilda anî kir nava garis û rya xwe da çûm.

Gote birê ortê, go:

- Qurba, deveke min hebû. Min gurze gîha didayê, ber dêrî dixar. Wextekê ez derketin ber dêrî, min nihêrî deva min tune. Ez gelekî lê geryam, çar-pênc roja, min deva xwe nedît. Min terk da, ez hatim mala xwe da rûniştîm. Min dîna xwe dayê helala min wê nan dipêje. Kûtek tendûrêda bû. Min go: "Evda xwedê, ewî kûtî derxe, ez bixum." Min kût xar, dîna xwe dayê, va gurze once ber deva inin –xirmîna wêye dixwe. Belê, ez îda mala xweda rûniştîm, guhê min lê siteqirî, îda ez lê nageryam.

Birê biçûk go:

- Gamêsekî me hebû, go, çolê diçêrya. Êvarekê nehat, ez çûm lê geryam, min dîna xwe dayê, müşkekî wê gamêşê min kişandye, kirye qulêda, struyê wê lê asê bûne. Strûyê wî nîbûna, wê bikişanda, bibira hundur. Gazî cotkara kir, cotkara sê nîr anîn avîtin, gainêşê min qulê derxistin.

Qazî go:- Qurba, wekî usane, hema ew boxçe tera dikeve, nedî kesî.

XAYÊ BIZINA

Du bira hebûn, sê-çar bizinê wan hebûn. Dane merivekî. Ewî bizin xaykirin. Rojekê birê mezin go birê xwe:

- Here bizinê me bîne were.

Birê çûk rabû çû bizinê xwe anî. Yek hate pêşiyê, dîna xwe dayê mişke. Mişk go:

- Xortê delal, tera oxirbe, tê ha kuda herî?

Go:- Ezê herime mal, eva bizinê minin.

Go:- Xortê delal, bizinekî nadî min? Ezê rojekê kêrî te bêm.

- Canim, go, tu mişkî, tuyê çi kêrî min beyî?

Evî xortî dîna xwe dayê boşe, go: "Canim, go, bizinek bira wîra be." Bizinek da wî, lêda çû. Hevekî wêda çû, dîna xwe dayê - eva mûrî. Mûrî hat, got:

-Qurba, tera oxirbe!

Go:- Hevalê oxirê bî

Go:- Ser çevara hatî.

- Ha, qurba, go çi dixwezî?

Go:-Qurba, ez bizinekê dixwezim, go, tu bizinekî nadî min? Ezê rojekê kêrî te bêm.

Ewî go:-Canim tê çi kêrî min bêyî, tu mûrîyî.

Dîna xwe dayê boşe, girt bizinek dayê, lêda çû.

Hevekî wêda çû, yekî din rastî wî hat, gotê:

-Tera oxirbe, xortê delal.

Go:- Ser çevara hatî.

Go:- Xortê delal, bizineke te maye, tu wê nadî min?

Go:-Tu kîyî, ez bidime te?

Go:- Ez xewim, go, ezê rojekê kêrî te bêm.

Evî mîrikî bizina xwe da wî. Bizinê wî kuta bûn. Çû ma xwe. Birê wî go:

- Ha, tu hatî?

Go: - Belê, ez hatim.

Go:- Ka bizinê te?

Go:- Min yek da xewê, yek da mûrî, yek da mişk.

Birê wî berî dayê, mal derxist. Ew rabû terkeserî dinê bû: berê xwe da şeherekî, çû. Dîna xwe dayê, wekî xazgîniyê qîza padişê wî şeherî hatine. Padişa qelinê qîza xwe nabire, dibê:

- Şertekî min heye, kî şertê min anî sêrî, ezê qîza xwe bidimê,-padişa dibêje,- min sîtilek tijî av kirye, daniye ser xalîçê, kê go, wekî sîtila min ser gotina wî bikele, ezê qîza xwe pêşkêşî canê wîkim.

Evî xortî go:- Sê bizinê min hebûn, min çû anîn. Wexta anînê, min dîna xwe dayê, eva mişk, min bizinek da mişk, yak da mûrî, yek da xewê.

Xelqê go:- Pe, top mala wî keve, dereweke çawa kir?

Go:- Hergê ez rast dibêjim, bira sîtil bikele, hergê rast nabêjim, bira nekele.

Wî çaxî sîtil kelya.

Dilê wezîrê padişê qîza padişêda hebû, padişê nedayê. Wexta padişa qîza xwe da gede, dilê wezîr xirabiyê hebû. Wezîr gede xapand, go:

- Kuro, xorto, ezê sed zêrrî bidime te, heftêkî neyê mala padişê.

Gede go: "Çi heye, ezê sed zêrrê xwe bistînim, qe heftêkê naçim mala padişê".

Qîza padişê dîna xwe dayê, go: "Ez qîza padişa bim, eva gedenga guh nede min?"

Qîzik çû cem bavê xwe şikyat, got:



- Bavo, wekî te ez dame wî xortî, ez nizaniim kurê şivanane, yan kurê gavanane?

Padişê girt qîza xwe da wezîr. Wezîr êvarê çû herema xwe. Wexta çû qîzê bibîne, xew situkurê siyar bû, nehişt qîzê bibîne. Wezîr usa cîbicî raza. Mûrî hatin hilkişyan ser wî, mûriya gelek gilyê bêtib kirin. Sê- çar roj wê formê derbaz kirin. Qîzik çû cem bavê xwe.

Bavê wê wezîr bire ser doxtir, wekî gilyê “bêtib çê nebe.” Lê êvarê, wexta wezîr çû herema xwe, îdî arxayîne.

Mişk hat, gote xewê:

-Îja dora mine, tu xew bike, bikeve çevê wîda. ïda dora mine.

Xew kete çevê wezîr. Mişk rabû poçika xwe kir nava birnotiyê, kire pozê wezîr. Wezîr bênijî. Mûrî careke din çûn ketin dev-bêvilê wî.

Qîza padişê çû cem bavê xwe, careke din bavê wê gazî xayê bizinê kir, careke din qîza xwe da wî.

Mişk, mûrî, xewê gotin:

- Em bin deynê te bizina derketin, de here mala xwe, îdî mirazê xwe şabe.

ŞIVAN

1.

Şivanek, navê wî Heso, diçe ber pezê merîkî qiral, heft sala ber pezê wî dimîne. Wexta cerd davêje ser pêz, pezê wî dibe, jê dûr dixe, pezekê xwera şerjê dikin, ew xwera dixun. Evê te duşurmış dibe: “Çi bikim ser kul û derdara”? Bilûra xwe digire xwe, lê dixe, dibê: “Eve, ezê yan pêz ji cerdê bistînim bi hunurê xwe, yan jî ezê xwe bikujim.”

Usa jî bilûra xwe digire xwe bilûrê dixe, gele bilûrê dixe gazî pêz dike, dike –nake pez gura wî nake... Gazî nêriya dike, nêrî ji nava pêz tek dibil, xwe davêjine avê. Dibe barîna pêz, pez temam derbaz dibe. Cerd hingê pê dihese, dinhêre- pez temam derbaz bû. Du pezêd kulek para digirin. Hevalê wan dibêje:

- Malxirab, wan herdu pezê kulek hûnê çi bikin?

Ewan berdidin. Yek tivinga xwe rast dike, dike ku şivanxe, bikuje. Hevalê wî jêra dibên:

-Çima gunê şivan dikî situyê meda? Ewî mîrikî tu mera şerr nekirye, bi bilûra xwe pez zivirandye û birye.

Cerdbaşî dibê:

-Şivano, here, şîrê diya te li te helal be.

2.

Cimeta gund şêwir danî, ku “Cerd bavêje ser mal, bibe qe bûye, wekî ku şivan bi bilûrê pez vegerîne, eva ne derewe?”

Şivan gote cimetê, go:

- Wekî derewe, emê bicêribînin!

Cimetê gote axê wî:

-Şivanê te gilî ha datîne.

Axê gote şivên, go:

- Gilyê cimetê raste, te pez çawa bê şerr û bê dew zivirand?

Şivan gote axê xwe:

- Ne şerr, ne dew, min bi zora bilûra xwe zivirand.

Axê wî gote şivan:- Eva derewe, te kiriye delk.

Şivan gote axê xwe:

- Wekî tu bawer nakî, tu min têxe avayîkî, wekî ez rûçikê pêz nebînim, tu pêz bide hineke dinê, bira ew pêz heft roja ser hev xwoedin, şev-roj xam biçêrînin. Şeş roj ku temam bûn, roja hefta tu min derxe derva, ezê bême ber çêm, dûr bisekinim, ezê bilûrêdim. Bera ew merî pez avêdin, hergê ku pêz av xar, bizanbe - gilyê min derewin, xêr, ku nexar -bizanbe ez ci dibêjim, gilyê min rastin.

Bi wê formê jî axê destpêkir, pez da hineka: pez şeş roja xwê dan, roja hefta şivan derxistine derva. Şivan bilûra xwe girte xwe, lêda. Ewan dûrva pez avêdan. Cimet jî top bûbû, hatibû temasê.

Ewana pez berî avêda, usa jî şivan bilûra xweda. Pez gihîste avê. Tu pezekê bi devê xwe firre av nexar. Pez ji avê dûr ket, şûnda hat.

Cimetê gote şivîn:

- Îzinê bide pêz, bira pez avê buxe, biecîn.

Pez kerba heta qefesê xwe avîte avê, têr ava xwe xar. Pezek nava avêda ma. Hineka go:

- Ew pez, ku sifte gihîste avê, ewê av xar.

Şivan go;- Na xêr, ew pez kerba zerpa tîbûnê, çaxê ku gihîste avê, çevê wê pezê rijiya, kete avê, lema jî ew pez seba çevê xwe avê dernayê.



Cimetê go: - Canim, ew mîrik cîna dikeve, çîma mî seba
çevê xwe ji avê dernayê?

Şivan gote cimetê:

- Hûn çîma min bê hurmet dikin? Wekî hûm min bawer
nakin, lingê we naşikê, çar hev herin binhêrin raste, yan derewe?

Ew cimet, çar hev jê çûn, nihêrîn, rast jî xebera şivêne, çevê
mîyê rijyaye.

Anîn nîşanî meriva dan. Hêja cimetê jê bawer kir, wekî ew
şivanekî erhedeye, gilyê wî raste, mîrikî gilyê xwe anî sérî. Bi
wê formê jî vegeryan, çûn.

Axê şivên hat, pez dayê, go:

- Here, gilyê te rast derket, şîrê diya te li te helalbe, wekî te
qelpî nekir, pezê min vegerand.



PADIŞA Û KOÇEK

Wextekê şeherekîda yekî belengaz hebûye. Padişê bihîst, ku ew koçektiyê dike. Di wî şeherî da jî hebû koma diza- cil meriv. Ewî cil merivî şevekê xizna padişa dizîn. Padişa sibê rabû, gotin, wekî xizna wî derevekirine. Padişê şand pey wî merivî, go:

-Tu aqa koçektiyê dikî, yan tê dizê xizna min derxî, yan ezê serê te lêxim. Çil şev ji tera molet.

Koçek vegerya hat mal. Ewan diza bihîst, ku koçek çûye cem padişê, wê diza bihese. Diza go:

- Yek şev here ser kuleka koçek, çika ci dibêje?

Koçek jî di halê xweda girya, go:

-Jinik, ji cilî yek hat, -ewî rojê xwe dijimirîn, go,-ma sîûneh.

Ew diz revî, çû, go:

-Xwedê mala we xirab bike, koçek tê derxist, go: "Ji cilî yek hatiye, go mane sîûneh."

Mezinê wan şeva din go:

-İşev dudu herin, belkî ew derewa dike.

Evana çûne ser kulekê. Koçek go:

- Jinik, go, zanî ji cilî dudu hatin, ma sîûheyş.

Evana revîn, çûn axê xwera gotin:

- Welleh, tê derxist, go: "Ji cilî dudu çûn, ma sîûheyş."

Mezinê wan got:

- Kuro pabin, dive padişe me teva bixeniqîne, ya pak ewe, em zêrêd padişê bibin mala koçek, bira koçek bibe bidê.

Zepp hildan anîn ber derê koçek. Gazî wî kirin, go:

- Ji boy xwedê be, me xilaske, an zêrrê padişê, bibe bidê.

Koçek go:- Nabe, wekî ez bibim, padişê bêje: "Ka wan meriva bîne bide min."

- Lê, go, bavê koçek tu çi dibêjî?

Go:- Zêrrê padişê hûn bi xwe bibin bavên ber derê padişê. Padişa îda wê nizanbe kê birye, kê anîye, avîtye, lê ezê jêra bêjim : "Çik hebû, merîfeta min bû."

Ewana zêrr hildan, birin avîtin heyata padişê.

Sibê cab dane padişê:

-Welleh, zerr anîne, avîtine heyatê.

Padişa gazî koçek kir, go:

- Koçek, eva merîfeta teye, çiqa zêrr hiltînî, hilde ji xwera.

Koçek go:- Padişayî saxbe, dinya ji minra zêrre,-û vegerya mala xwe, go,- jinik, xwedê ez çawa xilaz kirim!

HEFT KOSE

Heft kose birê hev bûn. Her heft kose rabûn, go:

- Em herin seyramîşî dinyayêbin, bigerin.

Evê te çûn. wextekê hespê wana tî bûn. Rastî kaniyê hatin, ji hespa peya bûn, hesp av dan, nanê xwe xarin, xwera razan. Birê çûk jî kirin qerewil. Wextek derbaz bû, birê çûk jî raza.

Kosekî din remila xwe avît, go: "Serê filan çiyayî heft bira razane." Evî hat hûr-mûrê wana gişk jê dizin. Evê te wextekê hişyar bûn, hûr-mûrê wana tune, go:

- Gelî bira, ïja em çawa dizê xwe bibînin?

Go:- Were em bavêñ benda aqila, em kosene, emê bi aqilê xwe diz bibînin.

Şêwir kirin, birê mezin go:

-Bira, dizê me dîsa koseye.

Birê din jî go:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave.

Birê din jî go:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mîna meye,
Li piştê heye hevan.

Birê din jî go:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mîna meye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan.

Birê din jî go:

-Raste, dizê me koseye,

Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mînameye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan,
Mala wî Hemedane.

Gotin:- Em siyar bin, em herin Hemedanê, çika dizê me li kuye?

- Ê, go, emê herin ku? Werin em bavên benda, çika dizê me li kuye?

Çûn kêleka şeher. Birê mezin go:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mînameye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan,
Mala wî Hemedane,
Mala wî taxa Nalbendane.

Yê din go:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mînameye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan,
Mala wî Hemedane,
Mala wî taxa Nalbendane,
Nerdewanê wî- sêsid şêstûşes nerdewanin.

Çûne ketin taxa Nalbenda, dîtin nalbend, paşê çûn dîtin nerdewan. Jina kose wêderê bû. Ew ji wanara tiştekî nabêje. Paşê dîsa didin aqilê xwe, davên bendê, birê mezin go:

-Raste, dizê me koseye,

Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mînameye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan,
Mala wî Hemedane,
Mala wî taxa Nalbendane,
Nerdewanê wî- sêsid şêstûşêş nerdewanin,
Perê me afirê gadanin.

Gihîştin ji afirê hûr-mûrê xwe derxistin. Nîvzerrekî birê çûk tunebû, gotin:

- Çira nivsiyê xwe digerî, emê ji aliyê xwe bidin.

Lê birê çûk go:

-Na, ezê nivsiyê xwe bibînim.

Birakî got:

-Raste, dizê me koseye,
Serê wî kulave,
Dizê me kose,
Kosekî mînameye,
Li piştê heye hevan,
Li hevanêda -
Neh şeş nan,
Mala wî Hemedane,
Mala wî taxa Nalbendane,
Nerdewanê wî- sêsid şêstûşêş nerdewanin,
Perê me afirê gadanin,

Nîfsiyê birê me paşila Gulkemêdane.

Gihîştin Gulkemdanê, paşila wê vekirin, nivsiyê birê xwe jê sitindin.

Wextekê mîrê wê, kosê Hemedanê hat. Gulkemdanê cab dayê, go: " Hal û hewal ev."

Evê te cab da dewletê, go:

-Mala min talan kirine.

Ersawil têñ wan kosa digirin, dibin.

Ewana gotin:

- Heyran, hûr-mûrê meye, em tê derdixin.

Go:- De werin em herin, çika hûn çawa tê derdixin?

Birin cûn, girtin.

Vana pûte genim kutan, bijartin, anîn kirin du kûpa. Tendûr dadan, dahiştine tendûrê heta sibê, hêta goştê ga jî avîtine nav, şeş-heft xorta li hevda. Sibê dîze rûnê çeleka helandin, da ser devê kûp, laçikek danîn ser devê rûn, anîn dîwanê, gotin:

- Gelî kosa, wekî hûn wane, işqila van kulava çiye?

Birê mezin go:

- Canim işqila van kulava dene.

Birê din go:

- Raste dene, kûpdane.

Birê dinê go:

- Raste dene, kûpdane,

İşqila wî goştê gane.

Birê din go:

- Raste dene, kûpdane,

İşqila wî goştê gane,

Heta sibê, go,

Şeş-heft xorta hevdane.

Birê din go:

- Raste dene, kûpdane,

İşqila wî goştê gane,

Heta sibê, go,

Şeş-heft xorta hevdane,

Ser devê wî rûnê çelekane.

Birê din go:

- Raste dene, kûpdane,

İşqila wî goştê gane,

Heta sibê, go,

Şeş-heft xorta hevdane,

Ser devê wî rûnê çelekane,

Ser devê rûnê çeleka kitane.

De welgerînin-

Teştiya me kosane.

Dixun û ji girtinê aza dibin.

ŞIMIKZÊRÎN

Wextekê mîrikek hebûye, jinikek hebûye û qîzeke wan. Wextekê jinik dikeve dimire: qîzik zef belengaz dibe. Bavê qîzikê dibê:

- Heta qîzik hiz neke, ez nazewicim.

Jinikek hebûye, ew jî bî bûye. Jinik tê bal keçikê, jinik dibêje keçikê:

-Bêje bavê xwe, bira min bixweze.

Bavê keçikê jinikê dixweze. Jinik qîza xwe jî xwera tîne. Wextekê disene keçika mîrik zef belengaz dibe: jinik keçikê dikute, dişîne ber dêwêr.

Çêlekeke wan hebûye. Keçik teşiyê û hiriyê hildide, diçe. Çêleka wê dêwêr topî ser hev dike. Keçik radibe ser zinêr, teşiya xwe dirêse. Bakî tenik teşiyê dixe, teşî diqete, diçe dikeve qula zinêr. Eva tê kûz dibe, teşiyê hiltîne, dinhêre pîrek wa têda. Pîrê banz dide ser xwe, dibê:

-Lawo, ca were niqurçikekê serê minxe.

Keçik gava dinhêre serê wê, bîna kurederê jê tê, pîrê dibê:

- Lawo, tişt serê minda heye?

Dibê:- Na, dayê, bîna diya min serê te tê.

Dibê:- Lawo, ezê razêm, ava reş hat- deng min neke, ava sorsipî hat – deng li minke.

Ava reş tê, deng wê nake, ava sorsipî tê deng li wê dike. Pîrê keçikê digire têda dike, keçik sorsipî dibe. Êvarê garana xwe top dike û tîne.

Diya wê dibê:

-Te iro qe hirî rist?

Tîne didê. Diya wê lê dinhêre bedewiya qîzikê, ecêbmayî dimîne. Qîza wê digirî, dibê:

-Sibê ezê herim ber dêwêr.

Wê şevê keçikê dikutin, ew tî-birçî dimîne. Keçik digirî, diçe ber serê çêlekê. Çêlek pêra dikêlime, dibê:

- Çima digirî? Tu qe megirî, ezê usa bikim kite dewar ser dewara nemîne.

Keçika dinê radibe, dêwêr derdixe, diçe. Çeleka keçikê nav dêwêr dikeve, vî alî, wî alî dêwêr dixe. Dêwêr radiqetîne, nahêle keçik hirya xwe birêse. Keçik digirî, qasekê disene, keçik bakî teşîya xwe dixe, teşî diqete, teşîya wê diçe, dikeve qula zinêr. Keçik kûz dibe, teşîyê hilîne, pîrê banz dide ser xwe, dibê:

-Lawo, ca serê min binhêre.

Dibê:- Ey pîrê, serê te çi pîse.

Pîrê dibêje:- Ezê serê xwe daynim, ava sorsipî hat, deng min neke, ava reş hat, deng minke.

Ava sorsipî tê, deng lê nake, ava reş te -deng lê dike. Pîrê dest-piyê qîzikê digire, têda dike. Qîzik reş dibe. Teşîya xwe hiltîne, dêwêr top dike, ber bi malê tê. Tê mal, digirî. Diya wê dibê:

-Çi bûye? - gava lê dinhere, reş bûye sekinye.

Dibê:- Dayê, çeleka êtîmê ez kuştım.

Dibê: - Lawo, tu qe netirse, ezê wê bidime şerjêkirinê.

Sibê xwe nexwes davêje. Mêrê wê dibêje:

- Kî dera te dêşê?

Dibê:- Parxanê min şikestiye, hergê tuyê çelekê minra şerjêkî, ezê pakbim.

Ev keçika êtîm dibihe, diçe ber serê çelekê rûdinê, digirî. Çelek pêra dikêlime, dibê:

- Tu qe negirî, ezê goşte xwe wana telkim, te şîrinkim, tu goşte min dixwî, hestûyê inîn navêje, hestûyê min têke torbekî, afîrê minda çelke, sibê-sibe destê xwe serda bişo.

Mêrik radibe, çelek şerjê dike, hine dil-cegerê wê şîşêra dike, dipêje. Jinik gava dixwe, dibêje:

- Jere, - dibê,- bide êtîmê, yanê jî goşte wê giştî bibe bavêje.

Mêrik dibê:- Hazir bira êtîm bixwe, çira bavêjim?

Êtîm wî goşti gişkî dixwe, hestûyê wê çel dike, sibe-sibe destê xwe serda dişo.

Rojekê gundda dibe dewat. Keçikê malda dihêle, sîtilekê dide ber, dibê:

-Tijî hêşirke.

Keçik hinek digirî, pîrek derî vedike, tê dibê:

- Lawo, tuyê çiçax tijîkî, rave du-sê cêrr ava xwe bîne, hine xwêya xwe bavê nav, temke, binhêr şorr bûye, paşê xwera here dewatê.

Keçik dibê:

-Xweliyê serê minkî, ezê ser çi xada herim dewatê?

Pîrê diçe. Keçik radibe sítîla xwe tijî av dike, xwêya xwe davê nav, radibe derê afir vedike, torbe derdixe, lê dinhêre – temam bûye zerr û zîv. Xwe dixemilîne diçe dewatê, dikeve sergovendiyê.

Keçika din dibê:

-Dayê, eva êtîma meye.

Diya wê dibê:

-Lawo, kura hat, me sítilek daye ber, ka tije kir?

Dewat betal dibe. Qîzika êtîm tê, hûr-mûrê xwe çel dike, ser kursî rûdinî, digirî.

Ewana têñ, diya wê dibê:

-A, lawo, min digo, vaye, te digo, na, êtîma meye.

Şewa dinê dîsa diçin dewatê, hine garis û birinc didin ber qîzikê, dibê:

- Tu ji hev bibjêre, heta em têñ.

Qîzika êtîm hinekî dibijêre, pîrê dîsa derî vedike, tê dibê:

- Lawo, rabe, dîk, mirîşka berde bira ji xwera bibijêrin, tu rabe here dewatê.

Dibê:- Xalî li serê minbe, ez kura herim dewatê?

Pîrê diçe.Eva te dîk û mirîşka berdidê, hev bibijêrin. Dîsa usa xwe dixemilîne diçe dewatê, dikeve sergovendiyê.

Keçika jinikê dibê:

- Dayê, welle, êtîma meye.

Dibê:- Lawo, kura hat? Me haqa birinc daye ber, ka kura bijart hat?

Dewat betal dibe, qîzika êtîm dilezîne, zû bê, şimikeke wê dikeve avê. Tê ser birinc rûdinî.

Jinik dibê:

- Lawo, a min digo keçik va maldane, te digo -na?

Sibê deve-dellî padişê têne ser avê. Deveke kor hebûye, disilike, avê naxwe. Padişa lê dinhêre xulamê wî egile bûn. Yekî dinê dişine – ew jî nayê. Kurê xwe dişine Kurê wî tê dibîne eva şimikek avêda. Şimikê tîne, tê, dibê:

-Qirarbe, şimik lingê kêra bibe, ezê wê bistînim.



Kurê padişê gazî şeherê xwe gişkî dike. Şimik lingê yekêra jî nabe. Dibê:

- Kê ma, kê nema?

Dibê:- Êtîma filankesê ma.

Gazî wê dikin, tînin, lingê wêra dibe. Kurê padişê xwera dixweze.

Wê şûnda heft roj, heft şeva xwera dikin def û dewat.

Ew çûn mirazê xwe şabin, hûn jî herin mirazê xwe şabin!

MERD Û NEMERD

Du xort serê rêkê hatin gihîsttin hevdu. Yekî go:

- Oxirbe, hevalo!

Go:- Hevalê oxirêbî, tuyê kuda herî?

Go.-Ezê herim xwera xebatê, go, ê, qurba oxirbe, lê tê kuda herî?

-Ezê jî wê herime xwera xebatê.

-Ê, qurba, pirsa etibê tunebe, navê te bi xêr?

-Navê min Merd, qurba, pirsa etibê tunebe, navê te bi xêr?

-Navê min Nemerd.

-Ê, qurba, Nemerd, were em bibine birayê hevdu, em hevra xwera bixebeitin, êvarê bêñ cîkî bisekinin, bîna me bi hev derê.

Sê roja hevra rê çûn. Nanê Merd xarin. Merd go:

-Birçîme, go, Nemerd, iro sê roje me nanê min xarye, niha jî nanê te bixun, em birçîne.

-Ê, go, wekî ez nan bidime te, îda çira navê min Nemerde?

O sê roja rê hatin, nan nedayê.

-Ê, go, wekî tu nîn nadî min, ez jî hal ketim, nikarim bêm.

Go:- Wekî tu bimrî jî, hizdikî jî çawa bibî, ez ku nan bidime te, tune, hiz dikî were, hiz dikî neyê.

Merd kete wan dera, hinekî pincar-mincar çinî. Pincara xwe xar. Qefeke dara wêderê bû û xwera kete wêderê. Dîna xwe dayêda, belebanekî wê xwera zêrra derdixe, ser selekî radixe. Rûvikî wêda hat, çev rûvî ket, zêrrê xwe kire qulikê. Dîna xwe dayê gur, hirç jî wêda hatin, pêşberî darê sekinîn, silav dane rûvî.

-Ê, go, rûvî, te qe iro ci dît?

Go:- Welleh, min tiştekî xweş dît, xweş jî unda bû. Go, ez hatim, belebanekî xwera zerr radixistin, heta ez hatim zêrr tije qulikê kir, çû.

Go:- Gur, te ci dît?

Go:- Min kerî pez dît, go, pezeke çarsitu wêda bû, go, serê wê pezê dermanê padişê şeherê Têhiranêye.

- Î, go, hirçê, te çi dût?

Go:-Min dît kêleka şeherê Têhiranê du-sê darik, bin wan
dara da du kûp zêrr hebûn.

Merdê te sibê rabû, dîna xwe dayê, beleban rabû zêrrê xwe
raxistin. Ewî banzda zerr ji beleban sitendin, kire hevana xwe,
çû. Çû dîna xwe dayê ew şivan, ew pez dît.

- Î, go, qurba, ew peza han nafiroşî?

-Qurba, go em şivanin, go, pezê axêye, bifroşe wê tomerî
bifroşe, em pê nizanin.

Go:-Qurba, axayê çi bike, go wê pezê bide min, ezê sêsid
manatî bidime te, tek serê wê bide min, cendekê wê tera.

Usa jî kirin.

Merd çû derkete şeherê Têhiranê, çû cem padişê. Dîna xwe
dayê, padişa, belê, rast ba lê bîter bûye, kotî bûye.

Merd go:

- Qurba, wekî padişa kotî bûye, go, hûnê çi bidine min, wekî
ez xilazkim?

-Î, go, belengaz, tu ku, ew gilî ku, go, guneyî, wê serê te
jêkin.

Go:- Ci heye, emê qirarê jêra girêdin, min ku xilaz nekir,
bira serê min jêke.

Cab dane padişa.

Padişê go:- Qurba, tu bizanbe,
wekî te ez xweş nekirim, ezê serê
te jêkim.

Go, qirarê xwe nivîsî, gote
padişê, go:

-Lê ez çi ku serê te bikim, tu
gere dengê xwe nekî.

Merd rabû, ew çend mêtirek
padisqe anî, serê pêz da
hincirandinê, stirû-mistrûyava,
rûyê padişê xist, canê padişê da,

anî padişa pêça, qalim lê şidand.

Padişa xwe bakir.



Go:- Qurba, min tera qirar girêdaye, gere çi bikim serê te, gere bikim.

Evê te wextekê raza, padişa jî pir hindikî raza, rabû canê wî wê pak bûye,go:

- Of, ez çi pak bûme.

Go, vekirin, go:- Zû bikin sîtile av bikelînin, bînin.

Av lê kirin, çermê wî temam jê derket, canê wî ma rût-tezî, silamet.

- Ha, go, padişa, qirara min?

Padişa go:- Kuro vî seybisanî bigirin bikujin, ewî ev ecêb kir, wê hela gelek ecêba bike.

Jina wî go:- Padişa, te qirar girê da, dewsa wî xelatkî, tu gazî celat dikî? Go, padişa, welleh ew der nabe, seba xatirê min azake, bira ji xwera here.

Padişa Merd berda. Merd gotê:

- Padişa, qeyde ne usa bû, bira usa be. Tu padişayî, her tiş destê teye, ez xulam, lê tu nemerdî,- lêxist, çû.

Çû, nifir li padişê kir, sond xar rojekê heqê wîra bê. Çû qîzeke gavana ji xwera xwest, çû rex wan dara malek çê kir, go:

- Jinê, here merrekê yan kulingekê bîne, yan ji nav şeher, yan ji mala bavê xwe.

-Ê, go, mîro, go, kuling, merr çî teranin?

Go:- Min lazimin.

-Ê, go, qey tê min bikuji, erdê vedî, min têkî çel?

Go:- Mala te xirabbe, ez çawa rabim te bikujem, awqa te hiz dikim.

Çû jêra merrek û kulingek anî. Rabû, kete bin darê veda, go, du kûp zêrr derxistin.

- A, go, jinê min seba van got,ha.

Dîna xwe dayê Nemerd hat pêş mala wîda çû, go:

-Ê, Nemerd, Nemerd, kuda derbaz dibî?

Nemerd dîna xwe dayê, eva Merd, go:

- Ha, go, mala te xirabbe, Merd, tu li vêderê?

Merd go:- Keremke, were mal.

Hat, go:- Kuro, go, Merd, eva mala teye?

Go:-Mala mine.

Go:- Te ev ji ku anî?

Go: - Dara ez lê mam, ez birçî mam, te nan neda min, go, ez wêderê mam, min ji wêderê anî.

Go:- De virra meke, mal xiravo, go, tu çima meryara rast nabêjî?

Go:- Welleh, serê te, ci ku raste, raste, min ber anije, xizina min ya ber darêye.

- È, go, ez herim çawane?

Go:- Here, bikeve qefa darê, hirçek, gurek, rûvîk wê bêñ. Netirsî, wê şewira xwe bikin, guhê te ser wanbe.

Evê te rabû, çû, çû, kete ber qefa darê, dîna xwe dayê gur, hirç, rûvî va hatin sekinîn. Rûvî go:

-Geli bira, go, ew zerrê wê rojê min dîtin, go, idî beleban dernaxe, go, nizanim ew zerr çawa bû?

Gur go:- Bira ew keriyê pêz min dît, iro min dîna xwe dayê, ew peza çarstirû ne navdane.

Hirçê go:- Bira, ez çûm, ew dara ez dibêjim, rex wan dara kirine xanman, ida ilac tune.

Rûvî gotê: - Usane, rabin, dibe merî vira hene.



Diçin, dîna xwe didinê, merîkî vaye, qefa darêda. Hirç digijê pişta wî dişkêne, gur jî zikê wî diqelişe, o rûvî jî pêda dikeve çarix-marixê wî dixwe.

Padişa jî dîsa kotî dibe, ida kesekî tu bêjî derman bike tune.

Merd jî xwera şeherê Têhiranê da kêf dike.


PÎRÊ Û RÛVÎ

Pîrek şîrê xwe berev dike, dike bin beroşê. Rûvî herro tê şîrê wê dixwe.

Pîrê rojekê xwe ditelîne. Rûvî tê şîr dixwe, pîrê poça rûvî digire jê dike, rûvî kulekêra direve diçe.

Pûvî diçe cem hevalê xwe, ew jî dibêjin:

- Hutoz, mitoz,
- Poçik ser poz.



Ew şerm dike, tê cem pîrikê, dibê:

- Pîrê, dêla min bide min,
- Ez herim bigîjime hevalê xwe.

Ew jî dibê:

- Here şîrê min bîne.

Rûvî diçe cem bizinê, dibê:

- Bizin,
- Şîr bide pîrê,
- Bira dêla min bide,
- Herim cem hevalê xwe.

Ew jî dibê:

- De here bêje darê,
- Bira dar çilo bide,
- Ez çilo bixum,
- Ezê şîr bidime te,
- Bibî herî, bidî pîrê,
- Pîrê dêla te bide,
- Herî bigîjî hevalê xwe.

Rûvî diçe cem darê, dibêje:

- Darê,
- Çilo bide,

Ez çilo bibim
Bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim cem hevalê xwe.

Dar jî dibêje:

-Here avê bîne,
Berî ser minde,
Ezê çilo bidim,
Bizin bê bixwe,
Bizin şîr bide,
Şîr bibe bide pîrê,
Pîrê dêla te bide,
Herî bigîjî hevalê xwe.

Rûvî diçe cem avê, dibêje:

-Avê, were ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim cem hevalê xwe.

Av jî dibê:

-Here keçika bîne,
Ser min bira şayîkin,
Ezê herim ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bide bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bide pîrê,
Pîrê dêla te bide,
Here, bigîje hevalê xwe.

Rûvî diçe cem keçika, dibê:

-Keçikno,
Dibê, werine ser avê,
Şayî bikin,
Bira av here ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim cem hevalê xwe.

Ew jî dibêjin:

-Here sola bîne,
Em herin ser avê şayîkin,
Av here ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bide bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibe bide pîrê,
Pîrê dêla te bide,
Here, bigîje hevalê xwe.

Rûbî îja diçe cem soldurî, dibê:

- Soldurî,
Sola bidirû,
Tême piyê keçika,
Keçik ser avê şayîkin,
Av here ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim bigîjim hevalê xwe.

Ew jî dibê:

- Here, hêka bîne.

Rûvî diçe cem mirîşka, dibê:

-Mirîşk,
Hêkê bide min,
Hêkê bidim soldurî,
Soldurî sola bide,
Tême piyê keçika,
Keçik ser avê şayîkin,
Av here ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim bigîjim hevalê xwe.

Ew jî dibê:

-De here mera qût bîne.

Rûvî diçe cem xayê bêderê, dibê:

-Ka hine garis bide min,
Ez bidim mirîşka,
Mirîşk hêka bidin,
Hêka bidim soldurî
Soldurî sola bide,
Tême piyê keçika,
Keçik ser avê şayîkin,
Av here ser darê,
Dar çilo bide,
Çilo bidime bizinê,
Bizin şîr bide,
Şîr bibim bidime pîrê,
Pîrê dêla min bide,
Herim bigîjim hevalê xwe.

Ew jî dibê:

- De were alî min bêderê rastke,
Ez garis bidime te,

Garis bide mirîşka,
 Mirîşk hêka bidin,
 Hêka bidî soldurî,
 Soldurî sola bide,
 Bikî piyê keçika,
 Keçik ser avê şayîkin,
 Av here ser darê,
 Dar çilo bide,
 Çilo bidî bizinê,
 Bizin şîr bide,
 Şîr bide pîrê,
 Pîrê dela te bide,
 Herî bigîjî hevalê xwe.

Rûvî dikeve nava bêderê, rast dike. Ew jî pêşa rûvî tije garis dike.



Rûvî garis tîne tê,
 Davêje ber mirîşka,
 Mirîşk garis dixun.
 Her yekê hêkekê tîne, didêda,
 Hêka hildide diçe cem soldurî,
 Îja soldurî sola didirû,
 Sola didirû, dide rûvî,
 Rûvî dibe, dike piyê keçika,
 Keçik diçin ser avê şayî dikan,
 Av diçe ser darê,
 Dar çilo dide,
 Bizin tê dixwe,
 Bizin şîr dide,
 Şîr dibe, dide pîrê,
 Pîrê dêla wî tije zengil-
 Xirxirk, bişkoş dike,
 Pîrê dêla rûvî didê,
 Rûvî diçe nava hevalê xwe.

Heval dibêjin:

-Hela evî rûvîî, berê me digo:

Hutoz,mitoz,

Poçik ser poz,

niha jî dêla xwe tijî zengil, xirxirk kirine,- dibêjine wî rûvîyî,
dibêن:

- Te ew ku anye?

Dibê:- Hûn herin hetanî sibê dêla xwe têne nava avê, ïja dêla
weyê zengil-xirxirk bigire.

Rûvî radibin, diçin,

Dêla xwe dikine nava avê,

Heta sibê.

Bûz dora wan digire,

Diha nikarin jê derên.

Ewana dikişînin, jêla nayêن.

Ew jî dibêjin:- Naka dêla me xirxirk girtine, jêla nayêن.

Zaru têne ser avê, wexta golê dinhêrin tijî rûvîne, dibêjin:

-Werin ein herin sa bînin.

Îja diçin sa tînin. Wexta rûvî dinhêrin se hatine wana, rûvî
jêla direvin, poçika wan diqete, diçine cem hevalê xwe. Hevalê
wan dibê:

- Hêja hutoz, mitoz,

Poçik ser poz.



ÇEQIÇEQ PADIŞA

Aşvanek hebû, car-cara xwera kiloç dipet, herçê ku nedixwer dadanî qulçekî aş û lêdixist diçû nava gund.

Wan çaxa rûvîk bîter bûbû, dihat, çıqa roj bû kiloç û nanê wî dixwer, lêdixist, diçû.

Aşvan dît, îlac nabe, rojekê xwe ber rûvî teland. Rûvî girt, anî ber mirinê.

Wî çaxî rûvî kîlimî, go:

-Herkê tu min bikujî, ci wê bikeve destê te? Tuyê postê min bibî herî ci jê bikî? Tu were min berde, ezê gelekî kêrî te bêm.

Aşvan go:- Tuyê ci karê bidî min? Tu rûviyê çolêyî, rûviyê dekbaz.

Go:- Ezê gelekî karê bidime te!

Aşvan da aqilê xwe, berda.

Rûvî çû, xwexwe fikirî: “Ez çawa bikim, wekî ez derew derneyêm?” Lêda çû cem padişê, go:

-Padişê me gotye: “Bira koda zêrra minra bişîne, ezê zerrêd xwe bipîvîm, çika zêrrê min çiqasîn.”

Eva padişa ro kir û pîva, go: “Canim, eva rûviye, ez ci zanim gotina wî raste, derewe? Min nav û dengê padişê usa nebihîstyê.” Careke din jî xwe fikirî, wezîrê xwera go:

-Wezîrê min, rabe, bide bira bibe.

Wezîr rabû, kod da rûvî. Rûvî hilda, çû. Gava ku kod bir gîhande aşvan, aşvan dêst girt, dawişand, erdê xist, çend zêrr ji dora toqê wê ketin. Ewî berev kir, rûviyê xwera firmax bû û got:

-Welleh şikir, ew jî tiştekî pak bû, ez bûm xweyê zerra jî.

Rûvî gote aşvan, go:

- Aşvan, zêrrekî bibe here bide polik. Dezmalekê tijî polik bike, minra bîne were.

Aşvan go:- Canim, tuyê polika ci bikî?

- È, go, heyran tera ci? Tu bîne were, lazîmî minin.

Ewî jî çû anî. Rûvî polik hildan, temam polikê xwe tijî dora toqê kodê kir, careke dinê koda xwe hilda, ber bi padişê şûnda bir, çû, bide xayî.

Wezîr hilda, bir çû, derê xizinê vekir, gava kod erdê da, serê wî werimî, go:

-Mala we xirabbe, ew padişa ser padişê merane, go, bawerke, dev-devî deh girvanke zêrr nava toqê koda mera hatibû, kete nava zêrra.

Gava ev gilî padişê xwra got, serê padişê werimî, got:

-Canim, padişa ser minra tune, ew padişa kura derket?

Rûvî demxatirê xwe ji padişê xwest, go:

-Zef razîme, padişê me go: “Welle, min zêrrê xwe pîvane, min cî guhastî kir.”

Padişa go: - Rûvî, neçe,- gote wezîrê xwe, go,- Canim xelatekî bîne bide wî rûvî, bira bibe here padişê xwera, wekî padişê wî bizanbe em ser wîrane.

Wezîr gote padişê:

-Ez çi xelatî bidimê, wekî layîqbe, bibe here?
Go:-Rabe koda zêrra biçûk bidêda, bira bibe here padişê xwera.

Rûvî kod hilda, anî.

Aşvan nihêrî, wekî rûvî tê, tiştek wê dêvda girtî tîne tê, xwexwera go: "Ev rûvî çi pakbû, wekî rastî min hat."

Rûvî koda zerra jî anî, dayê.

Jî wê rojê çendek derbaz bû. Rokê jî rûvî gote aşvan, go:

-Aşvan, tu rabe karê min bike, ez herim cem padişê.

Aşvan go:- Canim, tuyê herî, çi bikî? Hergê tuyê herî, em tev herin.

Rûvî gote aşvan:

-Wekî tuyê bêyî, aş bifroşe, xan û manê xwe gişkî bifroşe.

Aşvan gote rûvî:

- Xan û man minra ku hatine, aşe, ez aş jî bifroşim, emê çolê bimînin, tuyê ecêba bînî serê min.

Rûvî go:- Na, ez ecêba naynim serê te, ezê kareke pak bigihînime te, tenê tu gura min bike.

2.

Aşvanê te rabû, rex rûviyê xwe ket, berê xwe dane wî bajarê padişê. Çûn nêzîkî bajarê padişê bûn, wî çaxî rûvî gote aşvîn, go:

- Tu bîne wan zêrrêd cem xwe, bîne poçika minva girêde, min bixemilîne, ezê pêşya te herim, cabê padişêra bibim.

Aşvan anî rûviyê xwe xemiland. Pûvî lêda, çû. Şivan û gavan hatine pêşya rûvî, gotin:

- Ev çi rûvîkî delale?

Rûviyê te ji nava şivan û gavana derket, dûr sekînî, got:

- Qurba, ez ne rûvîme, ez wezîrê Çeqiçeq padişême!

Rûvî lêda çû gîhîste padişê, mizgînî padişêra bir, go:

- Padişê min tê mîvanê te.

-Ê, -padişê go,-eferim, bera bê. Hat ser çeva, ser sera.

Rûvî vegerya, hat pêşya aşvanê xwe. Aşvan hatibû, ber çêm sekînîbû, go:

-Aşvan, xwe li avêxe, were.

Aşvan xwe avê xist, derbazî wî alî avê bû, gote rûvî, go:

- Top oçaxa te keve, ez şewitîm vê surê, vê sermê.

Rûvî go:- Careke dinê bikeve avê, ez te mizdim.

Aşvan kete avê, rûvî pê lepê xwe pişta wî mizda. Aşvan ji avê derket. Rûvî gihişte kincê wî berevî serhev kir, girt avîte avê.

Aşvan go:-Top mala te keve, go, min zanibû, wekî tuyê ecêba bînî serê min.

Rûvî got:- Ecêb, ew ecêb nîne, ecêb ewe hê wê parra bê.

Aşvan go:- Xêra mala xwedêra, go, tu ber destê min ketayî, min tu hilbiryayî, li erdê xistayî, tu perçe-perçe bikirayî.

Rûvî go:- Binhêr, ezê va herim, lê hema temya min li tebe, tu gava digihîjî mala padişê, tu xeber nedî, ci xeberdan hebe, ezê caba padişê bidim. Ne xeberdî, ne bikenî.

Rûviyê te pêşyê çû, gihişte mala padişê, gote padişê, go:

- Ne tu bî, ne padşaya te be, lê te nedigo topraxa minda qaçax hene? Hatine pêşya padişê min, şêlandine, çûne.

Padişê go:- Şêlandine, go, ê ci heye, bira bê.

-Ê, go, devê bavê te zêdeye, çîma padişê min usa ayîn-oyîne, wekî usa xwe bi serê xwe bê.

Padişê go:- Lê em çawa bikin?

Go:- Rabe, ber derê xwe xalî-xalîça raxe, siyara bîne, bira cirid bikin, karêtê bîne sazke, deste kincê layîq bîne, ezê bibim, bera padişê min xweke, ija lêde bê.

Üsa jî wê formê kirin, lê hema rûbî gote padişê, go:

-Padişê min ku tê, perdê jêra girêde, bira bê piş perdê.

Paşê, gava ewî kinc aşvanra birin, aşvan jî gava çev kinca ket, ecêbmayî ma, go:

-Rûvî, ev ci ecêba tînî serê min?

Go:- canim, hê tu nerazîyî? Ne min go, ew ecêb nîne, ecêb ewe hê para tê.

Ewî jî kinc li xwe kirin, bû padişakî maqûlî temiz o lêdan çûn dîwana padişê.

Padişa lê nihêrî, wekî yê tezehatî yekî delalî hê ser wîrane. Ewî mîvan şande pişt perdê. Perda wî girê da bûn. Rûvî rîva şîret kiribû, gotibû: "Binhêr, aşvan, nebî tu xeberdî, ezê qîza padişê tera bixwezim. Nebî tu na-na dikî..."

Êvarê padişê kevin ji rûvîra go:

- Canim, wekî padişê te padişaye, lê çîma xeber nadî? Hilbet lale, çika ci hesabe, nayê rû me nakeve.

Rûvî gote padişê:

- Na, go, padişê min ne padişê gedaye, padişê min her kesîra xeber nadî.

Bi wî hesabî jî wextekê ma.

Rokê padişê dîsa go:

- Lî rûvî, em çawa bikin?

Rûvî gote padişê, go:

- Bîne emê qîza te bidine padişê me.

Padişê jî qebûl kir, go:

- Wekî hizkirina te heye, ewî jî qebûl kirye, diha başê, ezê qîza xwe bidime merîkî mîna wî mîrî, ew jî padişaye, kurê padişaye.

Padişa girt qîza xwe da aşvan. Heft şeva, heft roja jêra kirin dewat, ew gihîştin mirazê xwe.

3.

Wextekê ma, ïja rûvî gote padişê, go:

- Padişa, niha bajarê me hev xar, gerek em herin bajarê xwe. Eva wexteke em hatine vira, gerek tu me verêkî, em herin.

- Ê, go, qurba, ez diha hiz dikim. Wexta verêkirina we ezê zexîre û eskerê xwe wera daynim. Ezê we verê kim, herin.

Padişa rabû eskerê xwe saz kir, zexîra pênc-şes roja jêra danî, çadir û xêbetê wana temam pêra danî, karêtek anî zevê xwera girêda, esker derxist, verêkir.

Rûvî rabû pêşyê ket, berê xwe da bajarekî dinê, çû. Çûne kewşenê padişakî dinê. Esker hêwirî, çadirê xwe lêdan. Cab wî padişayê dinêra birin, gotin:

-Padişa, filan padişa hatiye ser te şêrr.
Padişê cab dayê, go:
- Qurba, go, şerê min tune.
Gotin:- Wekî şerrê te tune, padişê me şerr dixweze, bê şerr venagerê.

Paşê rûvî padişa xewle kir, go.
- Wekî tu şerr naxwezî, de rabe wekîl-wezîrê xwe hilde, bikeve nava loda, xwe veşêre, bira padişê me bê, têkeve nava şeherê te, gava ku binhêre tu padişa tê tune, wê bê xwera rûnî, hêrsa wî wê dayne, ïja paşê tê bêyî rû kevî.

Ewî padişayî usa jî kir: ew û wezîr, wekîlê xweva çûn ketine nava lodê, xwe veşartın.

Çeqiçeq padişa bi eskerê xweva ajotin nava wî şeherî. Bi gotina rûvî esker temam dora lodê girt. Rûvî go:

- Diz ketine nava van loda, bigirin loda bişewitînin.

Agir berdanê, şewitandin. Kuta bû.

Çeqiçeq padişa ser text rûnişt, bû padişayê wî şeherî.

Çeqiçeq padişa rabî (îda jêra digotin Çeqiçeq padişa) hê deh qatî ser xezûrê xwera zexîre, esker danî, go:

-Hûn ser çevê minra hatine.

Verê kir, eskerê te şûnda çû, gihîste bajarê xwe, mezinê wana gote padişê xwe, go:

- Halalbe zevê tera, hê ew deh qata ser terane, padişê mîna
Çeqiçeq padişa tune.



KURÊ PÎRÊ

Jineke pîr hebûye û kurê wê hebûye, xwexwe jî kesîb bûye, cote gayê wê hebûye. Rojekê dibêje kurê xwe:

- Lawo,-dibê,- cînarê me teva yê mî şerjê kirye, yê kavirr şerjê kirye, yê bizin şerjê kirye, yê kar şerjê kirye, yê dewar şerjê kirye, em jî xelqê dinhêrin.

Kurr gote dê:

-Çî me heye, emin du ga, wekî em gakî şerjê kin, sibê bihare, xelqê cot girêde, îja emê çi bikin?

- Lawo, go, heta biharê jî Xwedê rehme.

- Ê, dayê, go, sibê bihare, ga tune, ezê te girêdim?

Go:- Erê, lawo, heta biharê, wekî ga dest te neket, min girêde.

Kurr rabû, gayê xwe anî danî erdê, gayê xwe şerjê kir, goştê xwe xarin.

Ma heta biharê, rojekê kurê wê hat, go:

-Dayê!

Dê go:- Ha canê, lawo.

Go:- Bihare, xelq gayê xwe derdixe.

Go:- Sebirke, lawo, Xwedê rehme.

Çendek ma, kurr êvarê hat, go:

- Dayê, îdî xelq toxîn direşîne.

Go:-Lawo, sebirke.

Go:-Dayê, teze çi sebirkim, go, rabe, ezê te girêdim.

Kurî rabû cotê xwe û nîrê xwe derxist, gayê xwe girêda, diya xwe kire hevalê gê û toximê xwe hilda, çû serê zeviyê. Toximê xwe reşand, ho kire gê, şivek kişand namila dê.

Padişa wezîrê xweva pêva derket. Padişê go:

- Wezîr, em herin, çika ev çi tevaye?

Padişa, wezîr hatin, gotin:

-Kuro, tu çi dikî?

Go:-Radikim diha, go pezê xelqê hebûn, berxê xelqê hebûn, yê min jî du ga hebû. Diya min gote min: "Rabe, gakî şerjêke, em jî goşt bixun." Min gote diya xwe: " Bihare, cote, xelqê wê gayê xwe girêde, lê ezê çi girêdim?" Go: " Lawo, heta biharê Xwedê rehime." Min go: "Dayê, wekî biharê dest neket, ezê te girêdim." Go: "Ere, lawo, wekî ga dest neket, min girêde." Min rabû gayê xwe şerjê kir, me jî goştê xwe xar. Bihar li me hat, Xwedê ga negîhand, min diya xwe girê da. Min jî aniye, ez pê cotê xwe dikim.

Padişê go:- Wezîr, boxek heye nav naxira minda, tu meriya nahemilîne, go, ez bişînim, bira here ewî boxî bîne, belkî box lêxe bikuje, yaxa pîrê jê xilazbe.

Padişê kaxez dayê, go:

-Kurro, lawo, go, a naxira mine waye, here, go, bira gavan gakî bide te, bîne were pê cotê xwe bike.

Xort kaxeza xwe hilda, çû. Kaxez da destê gavan. Gavan go:

- A ewê hane, boxê hane,- dûrva nîşan kirê, go,- kuro, miqatî xwebe, boxê te bikuje.

Xort da pey box, dêla box girt, box kuta, nav garanê gerand, wesitand, anî hat cotê xwe girê da, ajot, diya xwe jî berda, çû.

Çendek ma. Padişa go wezîr, go:

- Em herin, go, çika halê xort bû çi?

Hat dîna xwe dayê, xort wê box girêdaye û dajo. Padişê go:

-Min go, boxê wîya bikuje, hela, hela binhêr box çawa girê daye? Go, qîzek min heye, wekî birçîna bimire jî, ranabe nan naxwe, go, lazime ez wê qîza xwe jî bidime wî.

Wezîr go:-Belê.

Padişa hat cem xort, go:

- Xortê qenc, qewatbe ji tera!

Go.- Ser çevê min hafî.

Padişê kaxezek nivîsî, dayê: "Cotê xwe dibî, berdidî, êvarê têyî mala min".

Êvarê xort cotê xwe berda û lêxist çû mala padişê. Padşe dîna xwe dayê, xort hat. Milê qîza xwe girt, dayê. Xort qîza hilda

anî. Ma heta sibê. Sibê rabû, cotê xwe girêda, çû cot bike. Êvarê hat, go:

-Dayê, kî xebitî?

Go:- Lawo, ez xebitîme, tu xebitiyî.

Go:- De nan bîne, em bixun.

Dê nan anî, ewê kurê xweva xarin.Qîzik ma ciyê xweda.



Sibê rabû, cotê xwe girêda, çû.Bûk sibê rabû nava malê gêzî kir. Êvarê kurê pîrê hat, go:

-Dayê, kê xebitî?

Go:- Lawo, ez xebitîme, tu xebitiyî, bûka malê mal gêzî kirye.

Go:- Dayê, kerî nan bidê.

Nanê xwe danîn,xarin, sibê rabû çû cotê xwe. Bûka malê rabû mal gêzî kir, av anî, sergîn anîn. Êvarê kurê pîrê hat, go:

-Dayê, kê xebitî?

Go:- Lawo, ez xebitîme, tu xebitiyî, bûka malê jî av anî, mal gêzî kir, sergîn anîn.

Go:- Dayê, nanekî bidê.

Nanê xwe xar, sibê rabû cotê xwe girê da, çû cotê xwe. Bûka malê rabû, go:

-Dayê, tu ranebe.

Şuxulê malê temam kir. Êvarê kurê pîrê hat, go:

- Dayê, kî xebitî?

Go:- Lawo, ez qurbana weme, go, tu xebitiyî, bûka malê xebitye.

Go:- Dayê, de rabe nan bîne îdî.

Hersêk tev rûniştin û nanê xwe xarin.

Rokê padişê go:

- Wezîr, hela em herin, go, çika halê qîza min çiye?

Padişa hat, dîna xwe dayê, qîz wê şinge-şinge, pirik rûniştye, qîzik jî dixebite. Qîzik devê xwe kirê guhê bavê xwe, go:

-Bavo, rabe!

Go:- Lawo, çira?

Go:- Zevê te merîkî usane, kî naxebite, nan nadê.

Padişa keniya, go:

- Wezîr, te bihîst?

Xort go:- Padişa, qîza te çi dibêje?

Go:- Dibê, rabe bixebite, tu nexebitî zevê te nan nade te.

Nanê wan hazir bû. Nanê xwe anîn xarin, xort go:

-Padişa, qîza te heta niha mîna xûşka mine.

Teze padişa anî qîza xwe girt dayê, def û dewata wana kir û rabû lêxist çû mala xwe.

PADIŞÊ QURE, QÎZA WÎYE AQIL Û TEMBELÊ BEXDAYÊ

Padişa û wezîrê wî kincguastî çûn seyranê, çûn nav şeherê xwe, dîna xwe danê merivek wê koxekî çûkî gemarda veleyzaye. Padişa wezîrra go:

-Gelo te merivê wî hesabî dîtine?

Dîna xwe danê, diya wî nava şeherda pars dike, hemîn kurr usa veleyzaye, nikare rabe, divê:

- Dayê, ez birçîme.

Divê:- Kurê min, min nan ji şeher topkirye, anije, de rabe buxe.

Wezîr û padişa lê dinherin, çika ci dikin? Dîna xwe danê dê hate ber serê kurê xwe, rûniş, nan ji torpê xwe derxist, kir devê kurr.

Padişa û wezîr hatine malê, go:

-Pîrê, ew ci teye?

Go:- Ew kurrê mine

-Ê, go, pîrê, tu çima nan dikî dêv?

Go:- Ew nikare rabe, nan bixwe.

- Lî, go, pîrê, tu çawa xwey dikî?

Go:- Dewrêş baba, diçim pars dikim, tînim dikim devê wî.

Go:- Navê kurê te çiye?

Go:- Navê kurê min Tembele.

Go:- Pîrê, wekî tu nan nedî wî, wê ranebe?

Go:- Dewrêş baba, ew birçibe ranabe, ez diçim pars dikim, tînim têm, dikime dêv.

Padişa vegerya, çû ser textê xwe, elamî şeherê xwe kir, go:

- Kesîba bigirin, kîjan merivê nan bide kesîba, ezê serê wî lêxim.

Êvarê dîsa padişa û wezîr kincguastî hatin mala pîrê, dîna xwe bidinê, ka îşev wê çawa derbaz bike?. Dîsa Tembel gotê,go:

-Dayê, ez birçîme.

Dê jêra go: - Padişa daye ser meriya, wekî nan nedin parsekçiya, parsekçiya digirin. Min îro nan nanye.

Go:- De binhêre, binê torpê teda nanê hûr û mûr heye, bide min, ezê îro pê ebûr bikim.

Ew herdu usa guhdarî dikin, dinhêrin pîrkeke jê pîrtir tê, hine nan torpeda, da pîrê, go:

-Duhva min topkiryе, maye kartu bûye, bira kurê te buxwe.

Padişa vegerya, çû ser textê xwe, cimeta padişê tijî dîwana wî bû, go:

-Gelî cimet, ez işev du şeve diçim, min ecêvek awa ditye, merivek wî hesabî vedileze, diya wî nan dike devê wî.

Cimetê jêra go:

-Padişa, xwedê ji te razîbe, te teze dîtye, go, îsal sî sale halê wî usane, go, te çima gunê kesîb-kûsîba kirye stuyê xwe, go, bira dîsa herin parskin, pê ebûra xwe bikin.

Êvarê, wexta cimet bela bû, padişa çû mala xwe. Qîza wî, jina wî hatin cem padişê. Jin û qîza xwera jî usa gotê. Qîzê got:

- Dive ku ez herim wî bivînim, belkî rabe, bibe meriv, qê diya wî pê nikare.

Padişa ser wê pirsê usa werimî, lê-lêbû biteqe, go: "Bira qirara min û xwedêbe,-dilê xweda got,-bira sibe li me ronbe, ez zanim ezê ci bikim."

Sibê gazî du qewaza kir, milê qîzê girt, go:

-Bibin herin bidine ewî Tembelî, ku min dîtye û pişta xwe bidinê, lêxin werin.

Dê ber padişê sekinî, kir, nekir îlac pê nebû.

Milê qîzikê girtin, birin çûn ber derê Tembel, teslîm kirin.

Go:- Pîrê eva bûka te,- û vegeryan çûn.

Pîrikê nav çevê xwe da, go:

- Gelî qewaza, ne nivînê wê jî tune, wekî têda razê, tenê qisîleke min heye.

Wan qewaza gotê:

- Pîrê, padişê mera gotye, me jî anye, hatye, tu zef xeberdî, padişayê serê te lêxe.

Qîzê go:- Dayê, hûn çawa, ez jî usa, ez anîm hatime dame kurê te, xwedê rehme.

Êvarê pirtî qisîl avît bin qîzê. Qîzê kincê xwe avîte ser xwe. Pîrê çû raza, hemîn Tembel ciyê xwedane.

Sekinî, sibe li me ron bû, li cimetê jî ron bû, çika çawa dibe?

Qîzê sibê go:- Dayê, neçe nava şeher, go, were ezê ji tera bêjim,- ewê sed quriş girt da pîrê, go,- dayê, here xarinê mera bîne were û deste nivîn minra û neste nivîn xwera bîne were.

Pîrê çû nava şeher destek xwera, destek wêra lihêf-doşek anî hat, hebe xurek anî hat, ji xwera xarin dane çê kirinê, go:

-Pîrê, karê te Tembel neketye.

Nanê wan hazır bû: xarin feraqek ji xwera kirê, feraqek ji qîzikêra kirê. Tembel ma bê par, go:

- Dayê, ez birçîme.

Go:- Padişê kirye qedexe, nahêle em herin nava şeher.

Qîzê anî hat hine nan danî kêleka wî, go:

-Rabe, bixwe.

Go:- Dayê, were nan têke devê min.

Pîrê go:- Xwe nanê min nîne, wekî ez têkim devê te, nanê qîzikêye.

Qîzikê jêra go:- Herdu çevê te derkevin, nan kêleka teye, dixwezî bixwe, dixwezî nexwe.

Birçî bû, bû qare-qara wî, go:

- Dayê, were nan bide min.

Qîzikê pêra şer kir, go:

- Diya te razaye, min daye kêleka te, rabe bixwe,- qîzikê hêdîka destê wî girt,go,- nan vaye, hilde û têke devê xwe.

Anî hin nan kire destê wîda, bi destê wî bire devê wî. Serê te çi bêşînim, ewê hîn kir, çawa nan têkin devê xwe, destê xwe da pişta wî, go:

-Rabe, rûnî nan bixwe.

Ewî go:- Pişta min wê bêşe, ez çawa rabim rûnîm?

Go:- Kuro, pişta te naêşe, go, çîçikek veqedime ser xwe, nan bixwe.

Nanê xwe xarin. Ew kete ciyê xwe, Tembel jî dîsa velezya bû. Qîzik sibê rabû, gazî pîrikê kir, dîsa pere da pîrikê, go:

-Mera xarinê bîne.

Pîrê şande nava şeher, xarinê bîne. Pîrê xarin anî hat. Êvara nan dixarin, wextê, heta wextê. Qîzik rabû çay da ser, hazır kir, sitekanek tije kir, da ber Tembel, sitekanek da dê, sitekanek jî xwera tije kir.

Go:- Qîza qenc, eva çiye, min sitekan nedîtye, eva çiye?

Go:- Eva çaye, bixwe, çayî pake. Tembel, rabe, rûnî, ez ji tera dibêjim!

Tembel rabû rûnişt, nanê wî da ber. Tembel çay nedîtibû, go:
- Ez çawa bixum?

Go:- De tu nan têke devê xwe, de go, çay serdake, nizanî ave, av.

Vexar, go:- Pa, qîza padışê, ci xweşe.

Sê sitekan danê, vexar, dîsa velezya. Nîvro nan, xarin çê kirin, da ber. Go:

-Qîza qenc, ev ci wexte, go, êvare, çiye?

-Na, go, eva nîvroye, inerî royê sê cara dixwe.

Tembel nanê nîvro xar.

Go:- Tembel, tu guneyî, go, were vira rûnî, ez dewsa te temizkim.

Ji wêderê rabû, hat hinekî jorê rûnişt. Qîzê cî nivînê wî temiz kir, qisîla wî danî, belgiyê wî anî û Tembel kire nava cî.

Sekinî, dîsa sibe ron bû, qîzikê kaxwez nivîsî, da destê pîrê.

Go:- Here filan ci, filan inixazê (dukanê) ci ku didin te, bîne.

Dê çû mixazê, ci ku danê anî hat da qîzê. Tembel jî ida radibe, rûdinî. Qîzê av anî hat, ewî ser-çevê xwe şûşt. Qîzê textek anî hat, da ber dêrî. Tembel ser rûnişt, dîna xwe dayê xelq wê waris ser milê wane, wê diçin mêşe bona dara, go:

-Ew merivê hana kuda diçin?

Go:- Tembel, ew diçin dixebeitin.

Go:- Welleh, ezê sibê wanara herim.

Go:- Here, tu wê bûyî pelewan.

Sibe ron bû, qîzikê balte, waris dayê û temîn li wan kir, go:

- Eva xame, bira wera bê.

Tembel pêra lêda çû. Kete nava mîşe, ji xwera dar birî. Pişfîkî terikî xwera girê da, mîna pelewanekî danî ser pişta xwe, anî hat.

Hate perê şeher çerçik hate pêşya wî, go:

- Tembel, tu darê xwe nafiroşî?

Go: - Ez nizanim firotan çiye?

Go: - Ezê sed qurişî bidime darê te.

Tembel girt darê xwe dayê, weke milekî xwera anî, hat, go: "Ezê bibim pê xarina xwe çêkim". Ew milê dar anî hate malê.

Qîzê jêra go:

- Hema keda te eva bû, te anî hat?

Tembel go:- Na min gelek anî bû, rêva merîk rastî min hat, min dayê, ewê din min anî.

Qîza xwendî bû, dar şewitand, bû komir, komir bû qursê zêrr, hesabê zerr. Go:

- Tembel, tu sibê dici, ciyê wê darê zanî, nebî-nebî tu didî kesî.

Tembel çû piştekî usa anî, hat, yê duh mezintir. Dîsa çerçî hate pêşyê, go:

- Tu darê xwe nafiroşî?

Go:- Na.

Kire sêsid qurişî jî, go:

- Na, xanim nahêle.

Piştiyê xwe anî, hate mala xwe. Qîzê ew dar şewitandin, bû pûte komira zêrr. Qîzê rabû şande mixazê.

De, her xwedê pê bizanbe ewî çiqa zêrr anî, dêmek, heta koka wê darê hebû. Qîzê ew gişk şewitand û bire mixazê, kire



mêşokekî, zerr anî hat. Tembel hê nizane -zêr, zîv çiye. Gede tenê zane, wekî dare. Keçikê jêra deste kincê teiniz kirî.

Qîzê avayîkî usa da çê kirinê, nolanî avayê bavê xwe, xanimanê padişa, wê formê kir. Dêmek lihêf-doşek, çawa sazê mala bavê wêda bû, ew jî ew bû. Xort êvarê dida hînkirinê û pêra kişik dilîst. Paşê rabûn û kişiyan çûn xanimanê teze.

Tembel go:- Qîza qenc, eva xanimanê padişane, tê serê me bidî lêxistinê.

Go:- Temo (îda nego Tembel), qe şayışa nekişîne, go, sibê kinceke teze xweke,- rabû kaxezek jî nivîsî, dayê, go,- here filan mixazê, kaxwezê nişande, go, ci ku te lazim dibe, hilde were.

Anî hat. Qîza qenc got:

- Temo, herî dîwana padişê, jêra temane be. Padişa cî nîşanî te da, tu rûnî, bê: "Padişa, tu cimeta xwe îro mîvanê minin."

Temo çû dîwana padişa, bi cimetêva rakir, kire karêtê, anî hate mala xwe. Padişê go:

- Eva mîna koçk û sera mine.

Cimet hat rûnişt. Xarin hate ber, kevçiyê wî zîv, kevçiyê zerr, dora tebaxa tev carekêva zêrr.

Berî hingê qîzê Temo şîret kiribû, xwexwe jî ketibû işkafê. Cimetê nan xar, Temo go:

- Edetê min usane, kî çida nan xarye, bira xwera bibe.

Padişa berî cimeta xwe sitekan û tebax kire bin qapûtê xwe, go: "Yê usa mala minda tune", paşê go:

- Gelo xarinpêja vê xarinê kîye?

Qîz ji işkafê derket, go:

- Xayê malê zevê teye, kevanî jî qîza teye, go, bavo; min digo merî meriya dikin merî, te digo na. Niha çawane?

Padişê qure şermêda ma.

ÇAWA PADIŞA BÛ RÛVÎ, WEZÎR JÎ TEJÎ

Nêçîrvanek hebû, navê wî Temir bû. Ew bû, pîredêke wî.

Temir diçe, rew û nêçîra xwe, dinhêre terewilekî delal devê berêdane. Temirê te dike marxê, gullê davê, terewil dikuje. Radibe post dike, berê xwe dide şeher, tê. Wezîr dibê:

- Temir, wî postî bide min.

Temir nadê. Temir tê mala xwe, pîrediya wî dibê:

- Temir, kesî cem te post nedît?

Dibê:- Dayê, welleh, wezîrê padişê dît.

-Ê, -dibê, - Çi got?

Dibê:- Ji min xwest, min nedayê.

Dibê: - Welleh, lawo, tê zirara xwe dêst bibînî.

Wezîr lêdixe diçe dîwana padişê, dibê:

- Padişayî saxbe, -dibê,- Temir postek anije hatye, angorî dîwana teye, dîwana padişeye, têda dardakî.

-Ê, -dibê,- bişîne pey Temir, em jê bistînin.

Du qewazê xwe dişîne pey Temir. Temir postê xwe hiltîne, lêdixe tê, ber padişê datîne.

-Ê,-dibê,- lawo, ez ci bidime postê te?

Dibê:- Padişayî saxbe, tu ci bidî min, ezê qebûlkim.

Padişa dibê:- Wezîrê min, ci layîqî Temire, em bidinê?

Dibê:- Padişayî saxbe, ci lazime? Temir nêçîrvane, hoqe gulle-barût bide wî, bira here xwera nêçîrê bike.

Padişa hoqe gulle-barût dide Temir. Temir hildide, diçe. Wezîr dadigere ser padişê, dibê:

-Dîwana te xweş dîwane, postê te xweş poste, dîwanê hestûyê fil bida çêkirinê, post têda darda kira, wê hê xweş bûya.

Dibê:- Wezîr, karî bîne were, ezê çê bikim.

Wezîr dibê:

- Padişayî saxbe, yê post anije, kare hestûyê fila jî bîne.

Padişa emir dike, du qewaza dişîne pey Temir. Temir tîne tê, wîra dibê:

- Lawo, tu gere hestûyê fila bînî, ezê dîwana xwe çêkim.

Temir vedigere, tê mala xwe, dibê:

- Dayê, ezê çiqa hestûyê fila bînim, wekî padişa dîwana xwe çêke?

Diya wî Temirra dibêje:

- Here cem padişa, tewaqê jê bike, bê, dixwezim cil balteçî, cil hîz şeraf, cil pût xwê, tev kîsî wezîr be, tiştekî te tê tunebe.

Padişa emirî ser wezîr dike, temam tundurist dike.

Temir diçe çiyakî bilind, cil pût jî liva dibe, dixe kaniyê. Kaniyê dimiciqîne. Ew cil pût xwê dibe, ser rya fila radixe. Çil hîz şeraf berî hewiza dide. Ew û cil balteçî xwe vedîşerin.

Dibe germa nava royê, germa qalin. Fil jorda têñ xwê dixûn, û tî dibin û têne ser kaniyê, dinhîerin av tune, devê xwe dixine nav hîza. Wê şerafê tevî hildîçinin, dixun. Germ lê zorê didê, tev bêhiş dikevin, qirr dibin.

Ew cil balteçî radibin, barê wan cil hespa tijî hestûyê fila dîkin. Temir tîne pêşkêş dide padişê.

Padişa tîne tê hosta digire, dîwanê bi hestûyê fila dide çêkirinê.

Pêşkêşa Temir didê, Temir diçe mala xwe.

Êvarê cimeta padişê tê dîwana padişê.

Wezîr dibê:- Padişa, bimbarek be, dibê, dîwana te xweş dîwanê, şemdana serê ziyê jî têda dardakirî bûya, dîwana te teze wê xweş dîwan be.

Padişa dibêje:- Wezîr, şemdana serê ziyê jî tu here bîne.

Wezîr dibê:- Padişayî sax be, yê çûye hestûyê fila anye, kare here şemdana serê ziyê jî bîne.

Padişa dişîne pey Temir. Temir tîne tê, dibê:

- Temir, gerek tu herî şemdana serê ziyê bînî.

Temir vedigere, tê cem diya xwe.

Diya wî dibê:- Temir, lawo, çîma usa bêmedeyî?

Dibê:- Wezîr min hatye xezebê, gotye bira here şemdana serê ziyê bîne.

Dibê:- Lawo, here mihîna çil cenû bîne, ezê tera bêjim.

Temirê te radibe qesta çiyê dike û diçe. Diçe ber kaniyê. Dibe germa nava roja. Mihîn cenûyê xwe hiltîne, têne ser kaniyê, avê bixun. Mihîn avê dixwe. Germ zorê didê mihînê û cenûya. Temir radibe wê germêda mihînê digire û çil cenûyava tê cem dê, divê:

-Dayê, ezê çawa herim şemdana serê ziyê bînim?

Dibê:- Temirê min, ziya çil şevî hişyare, çil şevî radizê. Tê mihînê siyar bî, tê herî. Ziya niha razaye, bi qewata mihînê, tu ku gihîştî ziyê, destê xwe bavêje xeleqê serê şemdanê û ling bide mihînê. Ziyayê biqîre, hulma ziyê agirê erdê keve, mihînê bi bayê xwe şemdanê xilaz bike.

Temir tê karê xwe dike, rê dikeve, diçe dikeve topraxa ziyê. Diçe dinhêre, rastî jî ziya wa razaye, şemdana serê wî mîna du çîra dişxule. Temir bi bayê mihînê destê xwe dixe xeleqê şemdanê, ling dide mihînê. Mihîn lê dixe, şemdanê serê ziyê diqetîne.

Qîrîn ziyê tê, agir, hêleptik erdê dikeve, erd dişewite.

Temirê te tîne, xilaz dike, tîne ber padişê datîne.

Padişa pêşkêşa Temir didê. Temir lêdixe tê mala xwe. Mihîn û cenûya berdide, diçine yêra xwe.

Êvarê cimeta padişê tê ser hev. Padişa şemdanê serê ziyê darda dike. De hestûyê fil, postê werdek, şemdanê serê ziyê-meriv hewas û hijmekare dîwana padişê binhêre.

Wezîr dibê:

-Padişa, bimbarek be, dîwana te xweş dîwane, lazime qîza Üşengî Şa têda rûnî, tera jintiyê bike.

Padişa dibê:- Wezîr, de tu here bîne.

Dibê:- Padişayî sax be, ez nikarim herim bînim, evê ev hunur kirye, ew kare here bîne.

Dibê: -Qewaz, qewaz, gazî Temir kin.

Qewaz gazî Temir dikin.

Temir tê ber padişê, temane dibe, dibê:

- Xizmeta te?

Dibê: - Gerekê tu herî qîza Ûşengî Şa bînî bêyî.

Temir vedigere berbi mala xwe, tê. Tê ser diya xweda digirî.

Dê dibê:- Lawo, çira digirî?

Dibê:- Hal û hewalê padişa eve, gotye: "Here qîza Ûşengî Şa minra bîne".

Dibê:- Lawo, here cem padişa, bê, ez te dixwezim cil gemî kîsî wezîr, cil def-zurneyî, cil qîz, cil xort, emaretê cil kerwanî – temam kîsî wezîr.

Temirê te radibe, diçe cem padişê, dibê:

- Ez te dixwezim cil gemî kîsî wezîr, cil def û zurneyî, cil qîz, cil xort, emaretê cil kerewanî tev kîsî wezîr.

Temirê te radibe, tundurist dike, temam davêje rûyê berê, berê xwe dide şeherê Ûşengî Şa. Li wir gemiyê xwe disekinîne, cil def û zurneyî lêdixe, cil xort jê dertê, cil qîz jê dertê, kêleka berê xwera dilîzin, kêf dikan.

Evê te cabê didine Ûşengî Şa, dibê:

- Tu rabe derê ser koçika xwe, binhêr çîka dînyayêda ci heye.

Qîza Ûşengî Şa lê dinhêre xort alîkî dilîzin, qîz alîkî dilîzin, cil def û zurne alîkî lêdixe. Temir pirtiyê xas derxistiye û zef arzan difiroşe.

Qîza Ûşengî Şa diçe cem bavê xwe, dibê:

- Bavo, gere îzina te hebe, ez herime temâşê.

Bav îzina wê dide. Qîza Ûşengî Şa cil carî hiltîne, lêdixe tê tamaşa gemiya. Qîza Ûşengî Şa navê wê Gulperî bûye, lê dinhêre emaretê wî, pirtiyê wî xas wê bi bahê şeyîkî difroşe.

Temirê te dikeve hundurê gemiyê. Qîza Ûşengî Şa, cil cariyê wê jî dikevinê. Temirê te qîza Ûşengî Şa dixapîne, dibe serê gemiya jorin. Temirê te destê xwe li hev dixe- ew cil xort, ew cil qîz, ew cil def û zurne temam têن dikevin gemiya. Temirê te gemiya rê dixe.

Li şeherê Ûşengî Şa dibe hewar, pey direvin, ê, eskerê ci bike? Gemiya xwe dane orta berê. Ûşengî Şa eskerê xweva porr û poşman vedigerin.

Qîza Ûşengî Şa her wextekê xwe dihese, wê li orta berêye.Ê, wê ci bike? Nikare vegere, nikare tiştekî bike, destê wê erd û

ezman diqete. Qîza Üşengî Şa îsmekî dixûne, gemiya derdixe erdê.

Wextekê gemî disekeinin.
Temir diçe cem qîza Üşengî Şa.
Qîza Üşengî Şa dibê:

- Te çima ha li serê min kir?

Dibê:- Emîrê padişê ser min
heye, ez te padişêra dibim.

Carek din qîza Üşengî Şa
dibê:

- Temir, qurba, ezê gemiya
rêxim, emê herin perrê berê
bisekeinin, bişîne pey padişê, bira
padişa bê.

Gemî têñ terefê berê
disekeinin. Qîz, xort, carî bira
derêñ xwera kêfkin, bilizin. Evê
te merîkî dişine: "Tewaqe padişê
dikim, padişa bira cimeta xwe
hilde bê ber berê, min qîza
Üşengî Şa jêra anî."

Bira ew merî cabê bide
padişê.


Padişa radibe siyar dibe, wezîr, cimetê xwera hiltîne, lêdixin
têne ber berê. Qîza Üşengî Şa nifîrya padişê dike, dibê:

-Padişa, tu bibî rûvî, wezîr
bibe tejî. Bira padişa bireve,
wezîr jî bide pey, bira eva
cimeta jî lê bikine qûjîn, bêjîne:
"Ha can, ha can..."

Usa jî dibe, padişa dibe
rûvî, wezîr dibe tejî.

Bira ew idî xwera herin.

Bira Temir teze dewata



xwe û qîza Üşengî Şa bike, heft ro, heft şeva defêxe. Bira cil cariya jî bide wan cil xortî, bira dewata wana jî bike.

Bira Temir bê ser textê padişa rûnî, bira yek cabê bide diya Temir. Bira diya wî jî def û dewatê bike, bira telal nav şeherda bikine gazî, bira bêjin:

-Temir bû padişa!

Bira Temir here mirazê xwe şabe, bira ewê din jî belayî malê xwe bin. Bira Temir îzina cimetê bide bela bibe.

Xêr û silamet ew çû mirazê xwe şa bû, em jî mirazê xwe şabin.



BILBILÎ HEZARE

Wextekê padişak hebû, sê kurê wî hebûn.

Derdek li padişa bîtmîş bû, hekîm neman, hatin ser padişê.

Carekê merivekî hat dîwana padişê, padşêra got:

- Padişa xweşbe, derdê te hekîma qenc nabe, zanî êşa te wê bi çi saxbe?

Go:- Bêje, kalê.

Kalê got:- Padişa, kengê bilbilî hezarreng, tiriyê cûrî te anî hat, kengê perrê bilbil li sûrtê te xistin û tiriyê cûrî xar, tê him cahil bibî, him jî ji wê êşê xilazbî.

Padişa gelek pere dane kalê û jêra got:

-Kalê, bilbilê hezarreng û tiriyê cûrî kêderêne?

Go:- Ada heft beradane. Baxê qîza padişê perî Dunyagozelê wêdane.

Padişa gazî hersê kurê xwe kir. Navê kurê wî biçük Mîrze Memûd bû. Padişê go:

- Lawo, hûn sê kurê min, doxtira minra gotye dermanê te perrê bilbilî hezare û tiriyê cûrîne.

Kura gotin:- Serê me oxira tedaye, bi pirsê meriv diça Qursê.

Hersê bira tividîra xwe dîtin, qederê pere ji xwera hildan, ji şeher derketin û çolî-çolistan bûn.

Wextekê hersê bira daxilî navâ şeherekî bûn. Ewana gelekî geryan û pirsîn. Kesekî cab neda, çika Ada heft bera li kêderêye.

Hedu birê mezin gazî Mîrze Memûd kirin, gotin:

-Bira, emê idî kuda herin? Diha kesek nema me jê pirsî.

Mîrze Memûd go:- Bira, bavêmeye, emek ber meda daye, li ku hebe, gerek em lê bigerin û bibînin.

Herdu birê mezin gotin:

- Bira, em diha ji şeher dernayên. Emê şeherda bipirsin.

Mîrze Memûd ïzina xwe ji wan xwest, berrî-berrîstan bû. Bera ew here ji xwera bigere.

Herdu birê mezin pere lê xilaz bûn. Ji wana yek bû kibabçî, yek jê bû hewleçî. Ewana şeherda man û ji xwera xebitîn.

Mîrze Memûd ew qeder geriya, negeriya, kesekî salixê bilbilî hezarreng û tiriyê cûrî jêra nedan.

Mîrze Memûd ji tiqûbê meriya derket, ket tiqûbê periya. Wextekê heya êvarê pêşya xwe nihêrî, dît, wekî dûkî zirav dikişê. Çû gihîst ciyê dû lê dikişya. Lê nihêrî, quesreke temiz. Derî vekir, çû hundur, lê nihêrî jinek sere têda rûniştye. Selam da jinikê. Ewê selama wî vegirt, cî nîşan da, xort rûniş. Jêra nan, xurek anî, da ber. Mîrze Memûd nanê xwe xar, texte hildan.

Jinikê jê pirsî:- Xorto, navê te çiye?

Go:- Navê min Mîrze Memûde.

Jinikê got:- Mîrze Memûd, qurba, tu û evder?

Mîrze Memûd got:- Dayê, hazır bibîne, qismetê min hatye vira.

Go:- Lawo, rast bêje, hilbet tu bona şuxulekî hatî, derketî vira?

Go:- Dayê, ez ji te venaşêrim, ez ji bona bilbilê hezarreng û tiriyê cûrî hatime vira, lê kes ji minra salixa nade.

Jinikê hilda got:- Mîrze Memûd, min ne bihîstye, hema xûşkeke min mezin heye, ew ji min wêdaye, dibe ku ew zane.

Ewana razan heta sibê. Sibê Mîrze Memûd teşte xar, pîrik pêra derkete derva, jêra got:

- Mîrze Memûd, lawo, te eva şiveriya hana te dîtye, tê wêra herî heta êvarê, ancax bigîjî wî serî.

Mîrze Memûd izina xw jê xwest, kete şiverê, berbi qesirê çû, here ku tu here. Heta êvarê lê nihêrî dûkî zirav ji qesrekê hildikişe. Çû, dît jinek têda rûniştye. Selam da jinikê, jinik cî nîşan dayê, Mîrze Memûd rûnişt. Nan, xûrek anîn. Nan xar, hinekî rihet bû. Jinikê jê pirsî:

- Xortê delal, navê te çiye?

Go: -Navê min Mîrze Memûde.

Jinikê go:- Mîrze Memûd, tu li van dera ci dikî?

Mîrze Memûd got:- Dayka delal, ez bilbilî hezarreng û tiriyê cûrî digerim.

Jinikê hilda got:

- Lawo, ez tişte usa nizanim, lê hema dibe xûşka mine mezin zanibe, ew ji wêdaye, li kêleka berêye. Tu rabe razê, sibê ezê rê nîşanî tedim.

Mîrze Memûd raza heta sibê, sibê pîrik pêra derket derva û jêra got:

- Lawo, te eva şiveriya hana dîtye, tu bikeve vê şiverê, tuyê heta êvarê bigihîjî.

Mîrze Memûd izina xwe ji pîrê xwest, kete şiverê, here ku tu here. Esir bû, lê nihêrî dû ji koçik serekê dikişe. Çû gîhîştê, nihêrî pîrek têda rûniştiye. Selam da pîrê. Pîrê selama wî vegirt, cî nîşan dayê, rûnişt. Nan anin, nan xarin. Pîrê pirs kir, go:

- Navê te çiye, xortê delal?

Xort go:- Navê min Mîrze Memûde.

Pîrê go:- Mîrze Memûd, pirsa etib nîne, tu ji kêdereyî? Tê kuda herî?

Gede got:- Dayka pîr, ciyê min dûre, ez hatime bilbilî hezarreng û tiriyê cûrî digerim.

Pîrê go:- Lawo, cîkî çetine, gelek meriv çûne, venegeryane.

Go:- Dayê, wekî tu nîşanî mindî, ci bixwezî ezê bidim.

Go:- Lawo, hatina te mirazê mine, ezim darê dinêda qîzek.

Qîza min li kîleka berê bû. Dunyagozel, qîza padişê periya hatibû seyrangê. Qîza minra gotibû: "Were, ez te ji xwera têkim carî." Qîza min pêra neçûbû. Niha ser qîza min ismek xwendîye, qîza min bûye beraşê aşa û digere, hema derman destê evdê serreşe. Ezê kewekê bidime te, bibe serda şerjêke, niqitkêd xûnê wê bikeve ser kevira, kevir wê biteqin, keçik wê ji nav derê. Hema ew zane, wê cî nîşanî tede yan na, em nizanin. Lê tiştek heyen, wexta te bilbilî hezare tiriyê cûrî anîn, were min bibîne, paşê here.

Wê şevê razan, sibê pîrê derkete derva, Mîrze Memûdra got:

-Lawo, eva şiverêya dûz diçe kîleka berê, milê aliyê rastê beraşê aşa digere, tu vê kewê serda şerjêkî.

Mîrze Meînûd kew hilda, çû kîleka berê, milê aliyê rastê beraşê aşa digere. Gîhîstê, kew serda şerjê kir. Bû şîrqîna kevir, qîzeke husul-cemal jê derket. Keçikê got:

- Ha tu ser çevê minra hafî, xortê delal, te çawa ez gîhandime mirazê min? Diya min tu şandî?

Go:- Qîza qenc, ya rast diya te ez şandim.

Keçikê go:- Wekî usane, tu birê minî, bêje çika tu bona ci hatî?

Mîrze Memûd got:- Ez hatime bona bilbilî hezare û tiriyê cûrî.

Keçikê got:

-Ho, birao, tiştekî çetine. Wekî tu bêcer bikî, ezê te bişînim. Tê ada bera derbazbî, erdê wê hezeke, çemûre, bêje: " Xwedê avake, ci erdekî rinde." Wî çaxî erdê li te bişide. Tê hinekî jî wêda herî, bax û baxçeye. Ew baxîcê Dunyagozelêye, ya padişê peryaye. Ber dergê pêşin du meriv sekînîne, tu gere zanibî,

wexta diçî cem wan, her yekê baltekî ser milê wane. Tu her yekê sîlekê lêxe, wê bêjin: “Of, çi xweş bû, gerek em te bigihînin mirazê te.” Tê ji wan bibuhurî. Ber dergê duda mî û gurin: gîha danîne ber gur, goşt jî ber miyê. Tu goşt bide ber gur, gîha jî ber miyê, wî çaxî ewan jî wê komekê bidine te. Tê herî hundurê bêx. Qîza padişa hundurê bêxda razaye, şemdanê jor û jêrin û kîlaka biguhêr. Fêzêda bilbilî hezarrengî qefesêdaye, serda baxê tipiyê cûriye. Lê gerek tu tiştekî dinê jî zanibî – sîngê wê heyâ jêrê vekirye, nevî tu diçî çiçikêd wê, sîngê wê, radikî. Wê rabe, tê dest-dest bibî xwelî. Tu tiriyê xwe biçin û derdana xwe tijike, bilbil bi qefesêva hilde, bîne. Wî çaxî bax û erdêva, kevir û kuçik, gişkê bêjin: “Bir!” Nebî tu pişt xweva dinhêrî, wî çaxî wê bêjin: “Bigir!” Dergê girtî xuber wê vebin, dergê vekirî nayên girtin, gur wê bêje: “Qenciya wî bi minra heye.” Tuyê herî cem celeta, wê bêjin: “Qenciya wî li ser me heye, em lêanaxin.” Tê xilazbî bêyi, lê hema şaşıyê nekî. Paşê bêyi cem min.

Milê çepê keçikê kevirek welgerand, gemeke kesk ji bin derxist, lê nihêrî bû şîrqîna berê, hespek ji nav berê derket, hat. Keçikê gem kuta devê hespê, got:

- Mîrze Memûd, were siyarbe.

Mîrze Memûd li hespê siyar bû, keçikê jî hespêra got:

- Bimbarek, tu Mîrze Memûd silamet derbazî wî berî verêkî, silamet jî bînî cem min.

Qîzikê temî da Mîrze Memûd, got:

- Tu devê berê gemê bikî binê kevirekî kivş.

Mîrze Memûd xatirê xwe ji qîzikê xwest û ser berêra çû derbazî wî alî bû. Mîrze Memûd gema hespê derxist, kire bin kevirekî kivş, kete berê.

Çawa keçikê gotibê Mîrze Memûd usa jî kir. Ewî tiriyê cûrî hilda bi bilbilva, orta herdu çiçikê keçikê paç kir. Dewsa devê wî bû dequeke reş. Gişka go: “Bir!” Ew li yekî nebû xweyî, hat gihişte kîleka berê. Gem ji bin kevir derxist, şîrqîn berê ket, hesp hat ber sekînî. Lê syar bû û lezekî dinê Mîrze Memûd çû cem keçikê. Hesp çû kete berê.

Mîrze Memûd keçikêva gihîştine mala diya keçikê. Dê rabû bi keçikêva gelek şâ bû, go:

- Mîrze Memûd, lawo, tu ser çevê minra bêyî, ew çi qencî bû, te minra kir.

Wê şevê li wir sekinî. Sibe safî bû, Mîrze Memûd perrê bilbilî hezarreng sûrtê pîrê da, livek tîrî dayê: pîrê usa bû, lola qîzeke çarde salî, ew jî gihîşt mirazê xwe.

Syar bû, berê xwe da rê, hat rastî xûşka optê hat. Wê şevê li wir sekinî heta sibê. Tîrî da wê jî, perê bilbil sûrtê wê xist, ew jî cahil bû. Sibetirê hat mala xûşka çûk. Wê şewê li wir sekinî, perê teyr sûrtê wê jî xist, tîrî dayê, ew jî cahil bû. Û berê xwe da olkê bavê xwe, ew şeherê birê xwe têda hiştibû, zivirî hat.

Rokê daxilî nava wî şeherî bû, wekî birê wî têdane. Lê nihêrî birak wê teşteke tijî hewile ser sêrî: “Ha hewile, hewile...” difroşe. Birak jî şîşek tijî kibab difroşe. Gazî birê xwe kir:

- Kuro, go, şerme, hûn min nas dikin?

Bira lê nihêrî, pey Mîrze Memûde. Kirine qîrîn, xwe avîtin pêşîra wî.

Mîrze Memûd birê xwe ji wê zilêqetiyê derxist, herekê deste kincê teze jêra sitend, herekê hespek jêra sitend, bi xwera siyar kirin. Siyar bûn, berê xwe dane şeherê bavê xwe.

Rokê daxilî nava şeherê bavê xwe bûn, Mîrze Memûd tiriyê cûrî, bilbilî hezarreng da bavê xwe. Bavê wî bû xortekî çarde salî, cahil bû...

Bira ew ji xwera kêf bikin, bixwin, hemîn tiriyê cûrî, bilbilê hezarreng ankiye hatye, îda çi talaşa wane?

Sibekê rabûn, şeher nihêrîn –dora şeher usa çadir lêxistine, hesabê siteyra li ezmîn heye, hesabê çadira tune. Çadirê kene? Yê Dunyagozelêne, qîza padişê periyane, xaya tiriyê cûrî, bilbilî hezarene. Keçikê kaxwezek nivîsi, şand padişara: “Yê bilbilê min, tiriyê min ankiye, yan hûnê bidin min, yan ezê şeher kaf û kûn bikim.” Padişa qêmîş nebû, qêmîşî Mîrze Memûd nebû. Mîrze Memûd lê nihêrî şeher gi ketye hesargê, kes newêre derê derva. Mîrze Memûd hat cein bavê xwe.

- Bavo, go, wekî şeherê te, tu diya minva, herdu birê minva ji bona min herin, ezê tenê çi bikim? Hema ku ez herim, yekim, bira min bikuje, ida kesîra dengê xwe nake.

Bav gele xirab bû, dilê bavê şewitî. “Ezim, go, yekî lola Mîrze Memûd, herdu kurê dinê ji minra çi bikin, çî minranin?” Milê Mîrze Memûd girt, çûn cem qîza padişa periya Dunyagozelê. Dunyagozelê jê pirsî:

- Mîrze Memûd, te çawa tiriyyê cûrî, bilbilê hezarreng anî?

Go:- Qîza padişa, go, ez hatim ber dergê bêx, du celatê te sekinî bûn, heryekî baltekî li ser mila bû, min her yekê şemaqek lêxist, herdu jî cîbicî rûniştin, go: “Of, meriyo, te çawa mirazê me kir, em jî wê mirazê te bikin.” Mî û gur girêdayî bûn ber derge, ber miyê goşt bû, ber gur gîha bû. Min gîha da ber miyê, goşt da ber gur, wana jî go: “Meriyo, te çawa mirazê me kir, emê jî mirazê te bikin.” Ji heft derê te sê derî vekirî bûn, çar derî girtî bûn, min hersê derê vekirî girtin, her çar derê girtî vekirin. Wana jî go: “Te çawa mirazê me kir, emê jî usa mirazê te bikin.” Tu raza bûyî, min şemdana ber serê te anî bin piya te, ya bin piya te anî ber serê te, min şemdana vê kêleka te danî wî alî, ya wî alî danî vî alî. Min şemdanê te bi hev guhêrin, min orta herdu çiçikê te paç kirin. Fêza teda tiriyyê cûrî, qefesêda bilbilî hezarreng, min bilbil hilda, tirî hildan, min lêxist anî hat.

Keçikê go:- Mîrze Memûd, çawa dibêjî usane, wekî te hinekî xêlif bigota, minê li texista, te bikira ax û xwelî, şeherê bavê te jî kaf û kûn bikira, kevir li ser kevir nehişa. Hema te ez nîşan kirime, dewsa devê te bûye dequeke reş li ser sîngê min. Ezê te bistînim.

Ü rabû eskerê bavê xwe şûnda şand, bi xwe jî Mîrze Memûd sitend.

Hêja şayî kete nava şeher, heft ro, heft şeva def û dewata Mîrze Memûd û Dunyagozelê kirin.

Hecîyê Cindî xudanê weke sed pirtûkane, emê li vir tenê bîbliografiya pirtûkên filologiyê û berevokên zargotinê bînin navê:

BERHEMÊN FÎLOLOGIYÊ, BEREVOKÊN ZARGOTINÊ

1. Kilamê cimeta kurmanca (tekst nivîsîn Hecîyê Cindî, dengnivîsandin û pêşxeber yên Karo Zakaryan), Yêrêvan, 1936.
2. Folklorâ kurmanca, tevî Emînê Evdal (ji 650 rûpêlên wê berevokê 570 rûpêl H. Cindî nivîsîne), Yêrêvan, 1936, paşê-Stanbul, 2008, paşê-Êrbîl, 2008.
3. Hikyatêd cimeta kurda, bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 1940.
4. Kerr û Kulikê Silêmanê Silîvî, êposa cimeta kurda, lêgerîn û têkst (lêgerîn bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1941.
5. Weten, 10 kilam bi zimanê kurmancî (tevî Samaon Gasparyan), rotoprînt, sala 1942.
6. Ewledêt weten, berevoka kilamên kurdaye sovêtiyê (tevî S. Gasparyan), rotoprînt, Yêrêvan, 1943.
7. Folklorâ kurdî, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1947.
8. Hikyatên cimeta kurda (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1952.
9. Şaxêd êposa “Kyoroxliye” kurdî, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (pêşxeber, nivîsarnasî bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1953.
10. Edebyeta kurdiye Ermenîstanâ Sovêtiyê, lêgerîn (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1954.
11. Memê û Zînê, beyt-serhatya cimeta kurda, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1956
12. Folklorâ kurmanciyê, Yêrêvan, 1957.
13. Hikyatêd cimeta kurda, Yêrêvan, 1959, paşê bi tîpêñ latîñî, Yêrêvan, 2011.
14. Beyt -serhatyê cimeta kurda (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1960.

Hikyatêd cimeta kurda, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî:

15. Cilda pêşin, Yêrêvan, 1961.
16. Cilda duda, Yêrêvan, 1962.
17. Cilda sisya, Yêrêvan, 1969.
18. Cilda çara, Yêrêvan, 1980.
19. Cilda pêncâ, Yêrêvan, 1988.
20. Cilda şesa, Yêrêvan, 2005, paşê- Duhok, 2006.
21. Beyt-serhatyê kurdaye êpîkyê, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (pêşxeber, nivîsarnasî bi zimanê rûsî, têkst bi zimanê rûsî, kurdî), Moskva, 1962.
22. Dîharbûna dostiya kurda û ermeniya di nava zargotinê da, lêgerîn (bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1965.
23. Gotara edebiyeta kurdaye Ermenîstanâ Sovêtyê, lêgerîn bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 1970.
24. Kilamêd cimeta kurdaye lîrîkyê, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (pêşxeber bi zimanê kurdî, ermenkî), Yêrêvan, 1972.
25. Hikyatêd cimeta kurda, bi zimanê ermenkî, Yêrêvan, 1973.
26. Şaxêd êposa “Rostemê Zale” kurdî, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî (pêşxeber bi zimanê rûsî), Yêrêvan, 1977.
27. Karxezal (Hikyatêd cimeta kurda, bi zimanê ermenkî), Yêrêvan, 1982.
28. Hikyatêd cimeta kurda (bi zimanê rûsî), Yêrêvan, 1985.
29. Epikên kurdî, pêşgotin, tekst u şiroker, Şvêdiya, 1985
30. Meselok û xeberokêd cimeta kurda, pêşxeber, têkst û nivîsarnasî, Yêrêvan, 1985.
31. Bahar, berevoka zargotinê, veçêkirî, Yêrêvan, 1988.
32. Úsiv û Zelîxe, beyt-serhatî, pêşxeber, têkst û nivîsarnasî, Yêrêvan, 2003.
33. Dimdim, beyt-serhatî, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî, Yêrêvan, 2005, paşê- Êrbîl, 2006
34. Şaxê destana “Rostemê Zale” kurdî, pêşxeber, 19 şaxê nû, nivîsarnasî, Dûhok, 2006.
35. Kilamên cimeta kurda, pêşxeber, têkst, nivîsarnasî, Yêrêvan, 2008, paşê- Êrbîl, 2008.
36. Folkilora kurda, Yêrêvan, 2009.

NAVEROK

| | |
|---|-----------|
| Şengilo-Mengilo | 5 |
| Gur çawa xapya..... | 8 |
| Gur çawa tırsyan | 10 |
| Rûvî û gur | 12 |
| Rûvî û mer..... | 15 |
| Rûvî û şêr | 17 |
| Meriv û şêr | 20 |
| Zewaca şivan..... | 23 |
| Caba aqıl | 26 |
| Şero, Polo | 28 |
| Derewîn..... | 30 |
| Xayê bizina | 32 |
| Şivan | 35 |
| Padişa û koçek..... | 38 |
| Heft kose | 40 |
| Şimikzêrîn | 44 |
| Merd û Nemerd | 48 |
| Pîrê û rûvî..... | 52 |
| Çeqiçeq padişa | 58 |
| Kurê pîrê | 64 |
| Padişê qure, qîza wîye aqıl û tembelê Bexdayê | 68 |
| Çawa padişa bû rûvî, wezîr jî tejî..... | 74 |
| Bilbilî hezare | 80 |
| BERHEMÊN FİLOLOGİYÊ, BEREVOKÊN ZARGOTİNÊ | 87 |

**HIKYATÊN
CIMETA KURDA
Weşana duyemîn**

**Ji zarbêja nivîsî û hazir kir
HECÎYÊ CINDI**

Pirtûk amade kir FIRÎDA HECÎ CEWARÎ



Şəffaflıq və təhlükəsizlik: «LIMUSH» UŞQ-ı təşviq edir:
R. Ərəvan, 40, Nizami 40, 76, həm. 58.22.99
E-mail: info@limush.am

